


Ji nîveka mîlîyadê adarê bi
vir ve artêşa tirk li ser
sînore başûrê Kurdistanê
hêzên xwe dicivîne.

Her çiqas
generalên tirk armanca
yê feygerê wê
dagirkirina ewletiya li ser
sînor da ku rê li ber
derbasbûna refên gerilla
bê girtin, bi nav bikin.
Lê tê dîtin ku artêşa tirk
amadekariya
dagirkirina başûrê
Kurdistanê dike.

Tê gotin ku di şerê
hefteyekê de li herêma
cur bi cur ên Kurdistanê
nêzî 100 leşkerî hatine
kuştin.

Bî hîmînare re
ser qur bû

NAVEROK



4

Tesîra pêşangeha "Wehrmach" lu ser civaka alman



8-9

Hevpeyvîn, bi Refik Sebir re: Her helbestek rengekî taybet e



11

Xîndal: Gulan û karwanê şehîdan

Ji Xwendevanan

EM kurd ji demeke dirêj ve, ji welatê xwe qetiyane û hatina metropolan, me adetên xwe yên feodal baş ji ser xwe neavêtine. Malbat ji bo ku me ji fikir û îdeolojiya me bi dûr bixin, zewacê û bingeha wê ya aborî didine ber me. Lewre ku aborî û zewac pêk bîn ji ev mesele diwartir dibin. Ger tu sûcê wî tune be jî, tenê ji ber ku kurdistanî yî tu wekî sûcdar tê hesibandin.

Di hundirê malekê de, dibe ku îdelojîyên cuda hebin. Lê belê ku mirov bi bîr û baweriyê xurt li rastiyê xwedî derkeve, dema ew qels be jî, ew dê, bi cih bibe û bi ser bikeve. Saleke berê, gava ku min cihê ku diviya ez lê hatibûma dinyayê dit, kes nizanê ku ez çiqasî dilgêş bûm. Ez gelekî ji malbata xwe hez dikim lê ez naxwazim ku pêşiya min were girtin.

BEXTIYAR

WEKÎ tê zanîn 3'yê gulanê 'Roja azadiya çapemeniya navneteweyî' ye. Ez li ser navê xwendevanên Azadiya Welat ên Kuşadasi, roja we ya 'azadiya çapemeniyê' pîroz dikim.

Roja 3'ê gulanê, roja "azadiya çapemeniyê" ye lê ne li Tirkiyeyê. Di erefeya vê roja girîng de, Rojnameya Demokrasiyê hate girtin, êrîş birin ser televizyona Flash'ê, heta îro bi sedan rojnamevan hatine girtin, hatine qetilkirin, dibin dezgehê îşkenceyê de hatine derbaskirin. Em êrîşên li ser çapemeniyê bi taybetî jî çapemeniya alternatîf şermazar dikin.

AYDIN BOR



Girtina Demokrasiyê û çetetî

SAMÎ TAN

Rojnameya Demokrasiyê roja 3'yê gulanê, wate roja azadiya çapemeniyê bi biryara DGM'ê hate girtin. Hewldanên derxistina rojnameyê nû, li hemberî dek û dolabên polîsan bi ser nekin û weşana rojnameyê rawestiya. Piştî ku biryara girtina rojnameyê kete dest, Xwediyê rojnameyê Celalettin Yöyler ji bo derxistina rojnameyê nû serî li çihên pêwist da, lê berî wî polîsan çûn bi darê zorê ji muxtarê taxa ku ew lê rûdine, kaxizeke ku tê de "kesekî wisa li vê navnîşanê rûnane, jixwe li wir avahî jî tune, erdekî vala ye" standin. Bi vî awayî jî serlêdana wî ji bo rojnameyê nû hate redkirin.

Li aliyê din berpîrsên rojnameyê didin zanîn ku biryara girtinê bêqanûnî ye. Li gorî qanûnanê divê berî demekê xwedî û gerîndendeyên rojnameyê li ser biryarê bîn agahdarkirin, ji bo ku ew karibin bêyî navberdayîn weşaneke nû derxin.

Lê tiştêkî wisa ne li gorî berjewendiyên rayedarên dewleta tirk e, lewre ew dixwazin ji bo demekê be jî bêtirs mafên mirovan binpê bikin, şerê psîkolojîk bêyî

ku kesî li ber pozê xwe bibînin, bimeşînin. Jixwe generalên tirk piştî nûçeyên ku li ser hovîtiya ku li Hethetkê hate kirin, ji rojnameya Demokrasiyê re gelekî hêrs bûbûn. Her wiha girtina vê rojnameyê ji bo operasyonên li ser başûrê Kurdistanê jî pêwist bû. Qet nebe haya gelê tirk ji rastiyan çênabe, çapemeniya mihemedok jî li gorî dilê wan dikare destanên serkeftinê ji wan re binivîse.

Tê zanîn ku hêzên tirk rojnameger jî herêma şer dîr xistine, lê dema mirov bala xwe dide rojnamegerên tirk, wekî ku ew ji eniya şer nûçeyan didin, destanan dinivîsin. Tiştên wekî "Mehmetçik koka terorîstan diqelîne, PKK'yî dizanin wê bîkevin kijan qulikê" dinivîsin. Dema mirov baş bala xwe dide nûçeyên wan, tê dîtin ku çavkaniya wan yek e, ango daxuyanîyên OHAL'ê ne. Êdî rastî ne wî rengî bin jî, çawa be kesî ku binivîse li rastê tune.

Jixwe nûçeyên wan ên li ser kes û rêxistinên azadîxwaz ji daxuyanîyên OHAL, brîfîngên generalan û îfadeyên îtîrafkarên pêk tên. Wekî mînak rojnameya

Gözcü hefteyek bi îfadeya Murat İpek a ku dabû polîsan derbas kir. Ew ji rojnamegeriyê bêhtir karê bincilkirina sûcê dewletê dikin. Îtîrafkarê ku demekê ji Tansu Çiller û Erbakan zêdetir derdiket televizyonan û bi rojnameyan re hevpeyvîn dikir, îcar hemû tişt xistiye stûyê berpîrsên rojnameya Demokrasiyê û îdia dike ku her tişt rêveberên vê rojnameyê bi wî dane gotin. Ev yek jî dide nîşan ku komploya li dijî Şanar Yurdatapan, li dijî vê rojnameyê jî bûye. Her wiha ew bûyer dide zanîn ku çetetiye rihê berdane nava kûrahiya civaka tirk, kesên jî pişeyên cur bi cur di ber re alîkariya çeteyan jî dikin. Ji tiştêkî surîştî ye ji bo kesên ku di vî şerê qirêjî de serkeftina hêzên dagirker dixwazin, alîkariya çeteyan bikin. Lewre her wekî Kahraman Bilgiç dibêje wan çî kiriyê bi fermana rayedarên dewletê û ji bo xêra dewletê kiriyê.

Lê, divê bê gotin ku bi dek û dolaban kes bi ser neketiye, dewleta tirk jî bi ser nakeve. Ew kirin belkî ji bo demekê dilê dagirkeran rihet bike, lê êdî her kes bi kirinên dewletê hesiyaye û kes pê naxape. Li aliyê din, dewletê bi vê kirinê, kevîr li gûzika xwe xist, lewre di rojêke wisa de girtina rojnameyê karê ehmeqan e. Her wiha rojnamegerên azadîxwaz li ber kirinên bi vî rengî serî natewînin û wê bi awayekî xurtir derkevin pêşberî gel.

Gulan û şehîd

MUHAMMED MUHAMMEDÎ

Gelê Kurdistanê, bihara jiyana xwe dijî. Li gund û bajaran gelê me hişyar bûye. Bi devekî biken û bi dilevîniyê germ ber bi avakirina welatê serbixwe û azad ve dimeşin û ji rûyê wan hêvî dipijiqe. Dayik bi rûyekî geş dergûşan dimêjînin. Ji çavên ku, ji hêstirên bêdeng mêhlûl dibûn, kêf û hêvî dibare. Li cihê lorikan, bi dilekî şah û bi helbestên li ser tolê û cengê dergûşan dihejînin û lorî dikin.

Gelê Kurdistanê pir xwîn rijand, lê tu carî negihîşt armanca xwe, heya derketina partiyê. Gelê me ew tiştê ku wînda kiribû di şexsê şehîdan de careke din bi dest xwe xist. Sedemê serkeftin û gihîştina desthilatiya gelêrî xwedan û xwîna şehîdan me ye. Wan bi canê xwe partî diyarî mirovahiyê kirin û bûn kaniya hêz û jînê ji bo partiya me. Ji ber vê yekê "Partiya me partiya şehîdan" e. Şehîd cewhera dîroka partiyê ye. Vê yekê jî hişt ku partî di kongreya xwe ya neteweyî ya çaremîn de biryarekê bistîne û meha gulanê mîna "Meha şehîdên berxwedan û şoreşê" bi nav bike. Ew jî girêdaneke bi bîranîna şehîdên serxwebûn û azadiyê re ye. Lê ka çima meha gulanê, çî girêdan di navbe-

Gel di bin koletiyê de dikir hawar û Kurdistanê di tariyê de dikir nalîn. Lê şehîd bi canê xwe rihê koletiyê dikuje û gel vedijîne, radike ser piyan û dîroka xwe ji nû ve dinivîse. Lewre şehîdbûn, azadiya ruh, raman, bîr û baweriyê ye.

ra şehîdan û vê mehê de heye? Ji bo gelê Kurdistanê cihê şehîdan çî ye? Emê vê yekê bêhtir di şexsê şehîdên gulanê de bidin vekirin. Bihar bi Newrozê dest pê dike û di meha gulanê de xurt dibe.


Xweza di zivistanê de dikeve bin koletiyê. Gul û kulîlk hişt dibin, dar tazî dimînin û tov dikevin bin erdê di tariyê de dimînin. Lê bi hatina biharê re, mêrg û çîmen hêşîn dibin, gul û nêrgiz çavan vedikin bi gulanê re, bêhna xwe belav dikin, her alî dibê jîyan. Lê ev bi berxwedaneke mezin li hemberî sermaye zivistanê radibe. Yanî xweza, ji koletî û hesîrtiya zivistanê azad dibe. Gel jî di bin destê dijmin de hate kuştin û înkarkirin. Jîyan ji bo kurdan xizanî, tarîfî, zilm û zor û lêdan bû. Dijmin koçber kir, hovîti, tevkuştin li ser gelê me da meşandin û nedihîşt ku kurd serê xwe rake. Yanê gel di bin koletiyê de dikir hawar û Kurdistan di tariyê de dikir nalîn. Lê şehîd bi canê xwe rihê koletiyê dikuje û gel vedijîne, radike ser piyan û dîroka xwe ji nû ve dinivîse. Lewra şehîdbûn, azadiya rih, raman, bîr û baweriyê û wekî ku Serok

dibêje: "Ger ku gelek kole be, wê bi şehîdên xwe ji koletiyê rizgar bike."


Di bihara gulanê de berfê serê çiyaran dihele û diherike ji zozanan, pê çem, cobar û kaniyên miçiqî der dibin, Firat û Dicle cer xweş dibin, pêlên kela dilê wan radibin, didin ber xwe zinar û lattan û tu caran astengiyan nas nakin, teva ji rê radikin.

Xwîna şehîdan jî dibe lehî, paşverûti û eşîrtî ya dijmin û sîxuran tune dike û dikuje, sînoran radike, yekîtiya neteweyî bi pêş dixê û bîra neteweyî bi pêş dixê. Bi vî rengî civateke azad ava dike. Ji nava mirovatiyê, dagirkerî û xwînmijiyê dixeniqîne, erdê av dide, gulîstana biratiyê diafirîne, tê de gul her dem geş û xweş e bi xwînê.

Belê şehîd hêza berxwedanê û kaniya jîyan û ava jîyanê ye ji bo gel. Gulên mizgîniya civateke nû û mirovekî azad e. Ji ber vê yekê jî, tê gotin ku "Şehîd namirin" û ev dihêle ku mirov bêje "Çawa bihar jîyan e, şehîd jî jîyan e" şehîd jî di cergê yarê xwe de, di nava xak û warê niştiman de, hêlinên xwe çêdike û tê de bêdawî dijî.



Li gorî nûçeyê ku roja 7'ê gulanê di rojnameya Emekê de derket, gerîlayên ku di operasyonên dawî de li Dêrsimê hatine kuştin, gelek îşkence dîtine, bi wêneyan hatiye îspatkirin ku guhên wan 6 gerîlayan ji hêla leşkerên tirk ve hatiye jêkirin. Beriya demekê li gundê Hethetkê ya Batmanê, bi tevî 3 gerîlayan, gundiyekî bi navê Hanîfî Karabulut jî hatibû înfazkirin. Beriya ku bûn kuştin wan jî gelek îşkence dîtibûn. Piştî ku ew kirin di hinek rojnameyan de derket, fermandarê leşkerî yê Batmanê I.Hakkî Mosaoğlu (Albay) bi daxuyaniyekê ev kirin red kir. Her wiha Musaoğlu çapemeniya ku van yekan eşkere dike jî tehdît kir.



MEDYA-Sena ku girêdayî DİSK'ê ye roja 6'ê Gulanê jî bo protestokirina girtina Rojnameya Demokrasiyê û êrîşa li ser Flash-TV'yê, her wiha jî, ji bo piştgiriya weşanên ku pest û kotekiyê dibînin kampanyaya înzeyê da destpêkirin. Di dawiya kampanyaya ku wê hetanî 16'ê gulanê bidome de, înzeyên ku hatine berhev kirin wê jî TBMM'yê re were şandin. Li hêla din Seroke Navenda PEN'a Kurd Haydar Işık girtina Rojnameya Demokrasiyê bi daxuyaniyekê protesto kir. Di daxuyaniyê de tê gotin ku dewleta tirk bûye dewleta çeteyan û ew politika wekî aliyekî şerê qirêjî tê nixandîn.

NÛÇE

Bi biharê re şer gur bû

Ji nîveka meha adarê bi vir ve artêşa tirk li ser sînorê başûrê Kurdistanê hêzên xwe dicivîne. Her çiqas generalên tirk armanca vê tevgerê wekî xurtkirina ewletiya li ser sînor da ku rê li ber derbasbûna refên gerîla bê girtin, bi nav bikin. Lê tê dîtin ku artêşa tirk amadekariya dagirkirina başûrê Kurdistanê dike. Tê gotin ku di şerê hefteyekê de li herêmên cur bi cur ên Kurdistanê nêzî 100 leşkerî hatine kuştin.

Şerê li Kurdistanê bi hatina biharê re gur bû. Li gelek herêmên Kurdistanê operasyonên hêzên dewletê û li hemberî van operasyonan çalakiyên gerîla pêk tên. Wekî tê zanîn ji nîveka meha adarê bi vir ve artêşa tirk li ser sînorê başûrê Kurdistanê hêzên xwe dicivîne. Her çiqas generalên tirk armanca vê tevgerê wekî xurtkirina ewletiya li ser sînor da ku rê li ber derbasbûna refên gerîla bê girtin, bi nav bikin jî, tê dîtin ku artêşa tirk amadekariya dagirkirina başûrê Kurdistanê dike. Tê gotin ku di şerê hefteyekê de li herêmên cur bi cur ên Kurdistanê nêzî 100 leşkerî hatine kuştin.

Li gorî agahiyên ku bi dest ketine di nav çend rojên dawî de hêzên tirk bi qasî 100 tanq piştî ku demekê li Tesîsen Bêhnvedanê ên Nezîrxanê (ev tesîs di navbera Nisêbîn û Cizîrê de ye) demekê rawestandî derbasî aliyê Şirnexê nêzî sînor kirin. Hate ragihandin ku artêşa tirk konvoyê ji 50 erebeyên leşkerî pêkhatî jî Amedê di ser Riya Hevrişmê re derbasî aliyê Şirnexê kirine û pişt re jî hinek ji wan şandine aliyê Silopiyê. Tê gotin ku ji ber têrnekirina qereqolên li ser sînor, qereqolên seyar hatine avakirin. Her wiha li Tesîsen Bêhnvedanê yê Heciyân ên Silopiyê û Tabûrê zêdetirî hezar zerîpoş (cemse) hatine civandin. Zerîpoşên ku ji Amed, Batman û Mêrdînê hatine li navenda Silopî û li Tabûra Tanqan a Cizîrê hatine bicihkirin. Wekî din 150 erebeyên leşkerî tijî leşker û malzemyên leşkerî jî Wanê hatine herêma Çelê. Digel komandoyên ku ji Tugaya Boluyê anîne, ji Tugaya Culemergê jî komandoyan tînin herêma nêzî sînor. Li gorî agahiyên Deriyê Xabûrê jî hatiye dorpêçkirin. Hate ragihandin ku hêzên

tirk di ser pirayên nûçekirî yê li ser Çemê Hêzil re derbas dibin û diçin li aliyê din konên seyara datînin. Li gorî agahiyên çiya û pesarên Çelê yê nêzî sînor jî aliyê firok û balafirên tirk ve tê bombebarankirin.

Li vê herêmê di navbera hêzên tirk ên ku dixwazin derbasî nava erdê başûrê Kurdistanê bibin û hêzên ARGK'yê yê ku berhingariya wan dikin de şerên giran derdikevin. Roja 4'ê gulanê de saet di 19.00'an de li herêma Serê Girê şer derket û di vî şerî de 7 leşker û cerdevanek hate kuştin, nêzî 20 leşker û cerdevan jî birîndar bûn. Tê daxuyandî ku kesên birîndar bi firokên leşkerî rakirine nexweşxaneyên Amed û Şirnexê. Li gorî agahiyên çavkaniyên xweçihî di nava hefteyekê de nêzîkî 97 leşker, 8 cerdevan û 6 gerîla di şer de hatine kuştin. Li Çelê 130 cerdevanî çekên xwe danîn. Li aliyê din Walîtiya Herêma Rêveberiya Ne-asayî (OHAL) bi daxuyaniyekê îdia kir ku di şerê çend rojan de digel 12 leşkerî 93 gerîla hatine kuştin.

Li Hezroyê êrîşa gerîla

Li pesara Hezroya Amedê hêzên ARGK'yê bi çekên giran ve roja 7'ê gulanê êrîş birin ser hêzên artêşa tirk ên ku ji navenda navçeyê diçin herêma herekatê. Di vê êşîrê de li gorî agahiyên ku bi dest ketine 2 leşker hatine kuştin û 3 leşker û 2 cerdevan birîndar bûne. Çavkaniyên xweçihî didin zanîn ku



erebeya ku leşker tê de bûne, hatiye rûxandin, piştî şer leşker û cerdevanên ku birîndar bûne rakirine Nexweşxaneyê Amedê.

Li Nisêbînê şer

Operasyona ku li Mîdyad, Kerboran, Mahsertê dest pê kiribû didome. Roja 6'ê gulanê li pesara Nisêbînê hêzên artêşa tirk xwestin biavêjin ser cihê ku gerîla lê binecî bûne, gerîlayan li hemberî vê cerdê berhingari kirin û şer derket. Di vî şerî de 3 leşker mirin û 4 jî birîndar bûn. Li gorî agahiyên ji ber ku haya gerîla ji cerdê hebû, qet zayiyat nedan.

Li Farqînê operasyon

Roja 6'ê gulanê di navbera gundên Cumat û Dolapdereya Farqînê de şer derket û di vî şerî de assubayek, 4 leşker û 3 gerîla mirin. Operasyona ku piştî vê bûyerê dest pê kir didome. Tê gotin ku car caran di navbera gerîla û hêzên tirk de şer diqewimin. Çavkaniyên xweçihî agahiya Walîtiya Herêma ya ku qala kuştina 25 gerîla dike, nerastandî. Hate gotin ku cendekê 3 gerîla-

yên ku hatine kuştin, birine navenda navçeyê.

Li gundê Soravanga Pasûrê erebeya leşkerî ya ku ji operasyonê vedigeriya roja 5'ê gulanê li mayînê qelibî. Di vê bûyerê de 5 leşker bi xedarî birîndar bûn. Her wiha li Şemreqa Mêrdînê cerdevanekî ku diçû cot pê li mayînê kir, lingê wî jê bû.

Li Şenköya Midyada Mêrdînê gerîla êrîş bir ser xeta boriya neftê ya Botaşê, li vir di navbera gerîla û cerdevanan de şer derket. Di vî şerî de cerdevanê bi navê Abdullatif Alptekin hate kuştin û du cerdevan jî birîndar bûn.

Li aliyê din jî bo leşkerên ku di bin bandora şer de mane, di nava Alaya Cerdirmeyan a Dêrsimê de Navenda Rehabîlîtasyonê hate avakirin. Hereketa hêzên dewleta tirk a li Dêrsimê didome. Lê tê gotin ku gelek leşker ji ber mercên şer bi wan giran tînin, xwe birîndar dikin ji bo ku ji eniya şer dûr bikevin. Li gorî pêzanînen ku bi dest ketine, ji bo ku rê li ber vê yekê bê girtin, navenda rehabîlîtasyonê hatiye avakirin.

NAVENDA NÛÇEYAN

Tesîra pêşangeha

“Wehrmach” li ser civaka alman

Navê pêşangehê

“Şerê rûxandinê û sûcên artêşa alman ên navbera 1941 û 44’an” e.

Pêşangeh dide ber çavan ku leşkerên alman yên ji rêzê, ne tenê ji bo welatê xwe şer kirine. Ew îsbat dike ku destê wan jî ketiye nav tevkujiyên ku heta niha tenê li yekîneyên SS’ê têne barkirin.



Dewletên hevalbend ên di Şerê Duyemîn ê Cîhanê de bi ser ketin, generalên Hîtler di Dadgeha Nuremburgê de darizandin. Ji van pêşengên nazîyan 12 kes bi cezayê mirinê, 6 kes jî bi cezayê hetahetayê hatin cezakirin. Lê belê leşkerên alman ên ji rêzê nehatin darizandin, ji ber ku ew ji sûcên şer ên ku nazîyan kiribûn, berpîrs nehatin girtin. Pêşangeheke ku berî demekê li Almaniyayê hate vekirin, niha her diçe di nava raya giştî ya alman de dibe sedemê pevçûn û guftûgoyên dijwar.

Polîsê alman, bi giştî ji bo rewşên awartê û li hemberî rehîngirtinê û her wekî din tedbirên ewlekariyê digire. Ew ji bo vekirina pêşangeheke dîrokî zû bi zû serî li tedbirên zêde tund nade.

Lê belê van rojan li derdora Dêra Ezîz Paul a li Frankfurtê ye, tedbirên mezin ên ewlekariyê pir balê dikişînin. Di hundirê vê avahiyê de, pêşangeha ku me behs kir hatiyê raxistin. Ew, hovîtiya artêşa alman a ku di Şerê Duyemîn ê Cîhanê de pêkanîbû, dide xuyakirin, ev yek jî gelek almanan ecêb hêrs dike.

Zilamekî alman dibêje: “Pêwîst e em rê nedin vê rezalaeta ku pê li rûmeta artêşa alman dike. Leşkerên me, ne

mirovkuj bûn.” Ev pêşangeh nîşan dide ku leşkerên alman ên ji rêzê jî di sûcên nazîyan de ne bêguneh in. Ew pêşangeh êşkere dike ku artêşa alman Wehrmacht wekî nazîyan li hemberî kesên sivil tevî nav hovîtiyan bûye.

Wêne û belgeyên tevkujiyê

Munîh, bajarê jidayikbûna tevgera nazîyên Hîtler e. Ew, paytexta Bavyayê ye û Bavarya dewleta herî kevneparêz a Almanya ye. Ji ber vê yekê, pêşangeh li vê derê rastî reaksiyonên pir tûj hat. Ji bo ku mirov karibe çavkanîya vê hêrsa mezin bibîne, pêwîst e ku mirov bi saetan di dûvê dorê de bimîne. Di dîroka bajêr de, heta niha tu pêşangehê ew çend kes berî xwe ve nekişandibû.

Navê pêşangehê “Şerê rûxandinê û sûcên artêşa alman ên navbera 1941 û 44’an” e. Pêşangeh dide ber çavan ku leşkerên alman yên ji rêzê, ne tenê ji bo welatê xwe şer kirine. Ew îsbat dike ku destê wan jî ketiye nav tevkujiyên ku heta niha tenê li yekîneyên SS’ê têne barkirin.

Bi wêneyên ku ji aliyê leşkeran bi xwe ve hatine kişandin, bi kaxezên leşkerî û nameyên ku ji aliyê leşkeran bi

xwe ve hatine nivîsandin, ev pêşangeh bi belgeyan dide xuyakirin ku wê demê li Yekîtiya Sovyetê û li Balkanan cihû, girtî û dilên cengê çawa hatine kuştin.

Wêneyên ku leşkerên alman ji bo bireweriyê kişandine, wekî belgeyên berbiçav diyar dikin ku leşkerên alman neheqiyên mezin li kesên sivil kirine û ew bêmehekme di cih de înfaz kirine.

Li ser vê yekê gelek nameyên hovane jî hatine peydekirin. Bo nimûne, di nameyekê de leşkerekî alman jî dê û bavê xwe re pesnê leşkeriya xwe daye û gotiye yekîneya wî ya leşkerî hezar kesên cihû kuştine.

Pêşangeh her wiha berhevoka herî fireh û biserûber a belgeyên pêselmîn e ku destkariya artêşa alman di tevkujiya sivilan de nîşan didin. Sazkarên vê pêşangehê dibêjin ku niyeta wan ne ew e ku hemû yekîneyên artêşa alman gunehbar bikin. Lê belê divê were zanîn ku artêşa alman Wehrmacht di pêkanîna hovîti û gelkujiyên li Sovyet û Yugoslavyayê de roleke mezin lîstîye.

Fritz Kreuzer leşkerekî bi tecrûbe ye, wî di nav artêşa alman de di dema xwe de xelatên mezin wergirtine. Wexta ku wî li eniyê Rusyayê ji bo Almaniyayê şer kiriye, di şer de ji lingekî

xwe bûye. Ew, bi awayekî êşkere piştgiriya raxistina vê pêşangehê dike û li dijî hevalên xwe yên berê jî bihêrs e. Kreuzer dibêje: “Rast e, ev tişt hemû qewimîne.”

Bi propogandayê tevkuji

Kreuzer dibêje ku wî bi çavên xwe dîtine ku ew bi hovîti bi destê leşkerên alman ên ji rêzê hatine kirin. Ew dide zanîn ku mêjiyê wî û yên hevalên wî yên ciwan bi propogandaya nazîyan hatiyê şuştin. Lê belê gotinên xwe wiha didomîne: “Divê civaka alman li xwe mikur were û qebûl bike ku artêşa wan a wê demê gunehkarê sûcên şer e.”

Her wiha Fritz Kreuzer dibêje: “Em alman çima vê rastiye qebûl nakin? Eger min bixwesta, min dikaribû wekî mexdûrekî hereket bikira. Min di şer de lingekî xwe winda kir û gelek caran ez birîndar bûm. Lê belê, ez hê jî ji mexdûrekî şer bêhtir, xwe mîna sûcdarekî dibînim. Ez bi dilê xwe tevî şer bûme an jî ji neçarî min xwe ji nişka ve di nav şer de ditiye, ev meseleyêke din e. Tiştê ku ez baş dizanim ev e ku di vê tevkujiyê de para min jî heye.”

Lê belê gelek leşkerên teqewîdbûyî bi Kreuzer re ne di eynî dîtinê de ne. Pêşangeh di nav civaka alman de bû sedemê pevçûneke dijwar. Hin leşkerên din her çiqas qebûl bikin ku di şer de sûc hatine kirin jî, wiha dibêjin: "Ew şerê man û nemanê bû. An divê ku te bikuşt, an jî tuyê bihatayî kuştin."

wêne û belgeyên tevkujiyê şerefa leşkeran kêm dike?

Hin ji wan jî bihêrs reaksiyona xwe li hemberî pêşangehê didin der û dibêjin ku bi raxistina pêşangehê, şerefa hevalên wan ên di şer de mirine, ketiye bin lingan.

Bo nimûne leşkerekî ji dema şerê bi navê Joseph Maendal dibêje: "Li gorî nêrîna min, ev pêşangeh tiştêkî nepêwîst e. Ew, hevalên me yê di şer de ketî, biçûk dixê. Eger wan hevalên me ev yek bi çavên xwe bidîtina, wê ji nû ve biketana binê erdê."

Pêşangehê her wiha hêrsa nijadperestên almanan jî rakir û neonaziyan jî çar aliyên Almanyayê ji bo protestokirina pêşangehê li Munîhê meşiyên. Meş bi navê "Bav û kalên me ne sûcdar in û em bi wan serbilind in" hate lidarxistin.

Şerê çepgir û nazîyan

Komên çepgir jî li hemberî neonaaziyan derketin. Vê lihevketinê di nav parlamentoya Bonnê de jî rû da û eynî

mîna filmê Lîsteya Schindlerê ku berî çend salan wekî bombeyekê kete rojê va civaka alman, vê pêşangehê jî di tevahiya Almanya de agirek vexist ji bo ku alman ji nû ve li giyana xwe bigerin.

Ji dawiya duyemîn şerê cîhanê ve hewldaneke mezin li Almanayê heye da ku civaka alman pê baweriya xwe bîne ku artêşa alman û yekîneyên nazîyan SS du tiştên ji hev cuda ne û tu gûnehê artêşê di pêkanîna hovîtiyên li dijî sivîlan de tune. Lê belê pêşangehê ev baweriya ku li Almanya bûbû wekî tabûyekê şikand û li ser gûnehkariya leşkerên ji rêzê yê alman, li nav raya giştî ya alman guftûgoyeke bêhempa da destpêkirin.

Alman çima şok bûn?

Pêşangehê gelek alman şoke kirin û tiştên ku nifşên kal ên alman dixwestin ji bîr bikin, careke din anîn bîra wan.

Leşkerekî ji wê demê Henrich Graf Von Einsind: "Li hemberî vê yekê nifşên me yê berê gelek dilteng dibin. Lê belê ev xort giş, bi tiştên wisa re pir eleqedar dibin. Ji ber ku ew li dibistanê tu car tiştê wiha fêr nebûne û ev agahî ji bo wan bi temamî nû ne. Dema nifşên nû yê ciwan çav bi van rastiyên dîrokî dikevin, di bin tesîra wan de şoke dibin."

Pêşkêşkirina pêşangeha Wehrmachtê wê li gorî bernameyêke birêkûpêk berdewam bibe û di pêvajoya



du salan de li gelek bajarên din ên Almanyayê ewê ji raya giştî re bê pêşkêşkirin.

Çi devera ku ev pêşangeh lê vebe, bêguman wê bibe gorepana guf-

tûgoyên dijwar û lihevketina nêrînen dijber.

COLLEEN CONNAUGHTON
WERGER: MAZHAR GÜNBAT

Amed û konên naylon

XURŞÎD MÎRZENGÎ



Ez ji ser Pira Dehçavî, ji hêla başûr, ji xwarê, li Bedena Amedê dinêrim. Beden, wekî kofiya diya min, ya bûkaniyê bixemlî û xêz e. Wekî bûkeke nav xêlî û ber perde li piya ye. Ew kevirên reş ên birî, li pêş çavên min dibin şehîr û temeziyên bûkan. Ew qorê zêrên kofiya diya min ên bûkaniya wê xuya dikin.

Ez derdikevim diyarê bedena ku dişibe dilê min ê qetandî û tûşkirî. Lê ew heybet û zexmiya wê bedenê tekmlî cesaret û mîrxasiya Apê min ê ji piştî min dide min. Ez xwe xurt hest dikim. Ez li diyarê Birca Heft Biran li dora xwe dinêrim. Di wê lîsteyê de ez dibînim ku, çêkirin û avakirina Bedena Amedê wekî çêkirina dilê pîrika min Zorê ye. Ewa ku bi rêz, ewa bi zêr û bi zeber hatiye damezirandin. Reşiya wan kevirên wê bedenê li pêş çavên min çil sipî dibe. Tava xwe dide dilê min û dilê min ê tûşbûyî pê ronî dibe; ew qas ronî dibe ku diçirise û dibiriqe. Şewqa xwe dide taxa xûça min. Xwarziya min Mîdya û xwarziya min Sîdar derdikevin ser şanêşinê û ji min re dest dihêjin, nişana zafer û bi serketinê çêdikin.

Ez li xwarê dinêrim, di binê min de taxa Elî Paşa heye. Xaniyên taxa Elî Paşa, xaniyê

belengaz û perîşana min. Wekî xaniyên deşta Silîvan, ji axê, yek tebeq û bi sifirmek in. Li pêş karxana çeltûgê, zarokan bi kapan û xarê dilehîzkin. Lawikekî pênc şeş salî, kerîkî nanê tîsî di destan de, başewal, pêxwas û tenê kirasekî kin ê qilêrî lê bû. Di binê dîwar de rawestayî û çilmê wî pê de dihatin xwarê. Wî çilmê wî di şûna simbêlên wî yê sibê de, du şetên çeman anîbûn holê. Lê ez bi ziyareta Qalî Baba kim, ew awirên wî lawikê başewal wekî awirên Evla bûn. Bi xwarina wî keriyê nanê tîsî, xwe ji pêşerojê re hazir dikir. Çiqas jî lawikekî xweşik bû, ez bi heyrana wan awiran; mirov digot qey ji timika şêr ketiye. Awirên wî wekî awirên pilingekî bûn. Dişibiyên wî lawikê Licî...

Haa ji Dêra Meyremayê û bi vir de, di nava Kûça Siyawîş de, li kêleka xaniyê Şoboyê Qaçaxçî dawetek hebû. Di kûça şerhran de, berbûrî û xwendiyên bûkek di nava xêliyeke rengîn de, bi tîlî û çepikan bi aliyê xaniyê dawetê ve dianîn. Li şer xaniyê mala zava qelebalix hebû û Yasoyê mirtib defa xwe didirand. Gava bûk anîn beralî zava, zava ji serê xanî berê şeşderbê berjor kir û şeş derb di nava valahiya Bedena Diyarêbekir de vala kir. Li ber derî cerek dan destê bûkê û bûkê ew cer li bin goyê erdê da. Ew nok û şekirên di nava cer de belawela bûn û zarokan ji bona şekir û nokan ser û goyên hev xwarin.

Ez ji ser Birca Heft Biran çûm ser Birca Bizîne çiyê ku Zekiye Xanimê Newroz pîroz kiribû. Li wir, min ayetên şerha dilê xwe ji Zekiye Xanimê re xwendin û teslîmê giyana wê kirin.

Ez zivîrîm hêla Deriyê Rihayê, heywax li min o.

Wî alî taxa Rezan, hêla Elîparê hemû ji

konên kundên gundşewatzede dagirtibû. Konên wan ne wekî konên koçberiyê, konên naylonin bûn. Di nava çit û perdeyên wan konên naylonin de, cilên zarokan yê baravê raxistibûn. Ew cilên ser çit û perdeyên konan çend reng bûn nizamim, lê hemû rengin bûn û qetandibûn. Mala min ê, dilê min şewitî...

Di şikefta dilê min de agirek hîlbû û pêtiya wî agirî çû giha Esmayê (Diya Hz. Adem). Xwedê wekîlê min û we be, ez ji hêrsan û qehran, wekî dînan ji xwe re keniyam. Heke qedeha mey li ba min hebûya, ji şûşeyla bi dilê şikestî minê bi serê xwe dakira. Mirov digotin qey xwediyên wan konan dest avêtine namûsa hinekan, jinên hinekan ên bi mar revandine û rebenan maçir bûne û ketine wî warî.

Ez ew qas tî bûbûm ku min deh tas ava Hemrewatê vexwara dîsa jî, tîna min dedîşkiya.

Ez li Derê Çiya ji Bedenê daketim xwarê. Şerbetçiyê rehên sîsê ew tasikên wekî zengil di destan de û ji wê da dihatin. Şerbetçî digot: "Şerbetçî geldi, Bavê Zero geldi..."

Ez giham ber Bavê Zero û min çar tas şerbeta rehên sîsê vexwar. Bi zorê kelewaca nava min tefiya û tîna min şikiya. Çaxa min şerbet vedixwar, qefleyê gurên devbixwîn di ber min û Bavê Zero re derbas bûn. Min li wan gurên devbixwîn nêrî lê vereşîna min hat û min tû kir erdê.

Piştî tûkirina min, Bavê Zero jî xwe tîrş kir û wî jî gurzek tûk li dû wan guran avêt.

Ez û Bavê Zero, em bi awiran bi hev re keniyam.

Xwiricîna stêrkekê

Rojekê em li serê geliyên bilind, nêzikî çiyayê Munzur li aliyê Bakur mabûn. Spîbûna berfê li dijî axa reş bû. Em ber bi dawîya taqeta ve diçûn, ava ku ji helandina berfê parzûn dibû, diherikî, bi çûk û mezin bi sedan çok çedikirin. Ew çok diherikîn nava cokekê ku niha wekî çemekî mezin dihat xuyakirin. Ew çok havîna nedihat guzeka lingê mirov, du gavan firehiya wê bû û li aliyê din diherikî, ew çok pêş gereke ecêb bû. Sorgûnê nû ku ji axa qelişî dabûn der, berê xwe zivirandibûn rojê û heyfa zivistanê ji biharê distandin.

Heycana dilê şoreşê hatibû ber devê wî, wa ye dema ku nayê berdan hatiye. Lêvên wî yê zûwabûyî û cirifandina destê wî zêde dibû. Lê belê çavên wî yên biçûk mîna gurê ku li neçîra xwe digere bûn. Ji hedefa xwe nediqetiyên, qelewîska rûniştîye, keleşa xwe çep û rast xistibû hembêza xwe û disekinî. Carekê li kêleka xwe li hevalê xwe yê ku hinek jê wî de di kozikê de ye nihêrî. Hevalê wî jî wekî wî bédeng rûniştibû, li jêr guhdar dikir. Ji rûyê wî pir bêhnfirehî xuya dikir û çavên xwe li jêr digeranandin. Bi acizî dilopê xwêdanê ku li ser eniya wî civiyabûn bi destê xwe paqij kirin. Ji xwe re digot: "Ev şerê min ê yekemîn e, ji ber wê ye." Dîsa çavên xwe berdan cihê ku bi darê zirav ê berû ve nixumandî ye, ew li wê tenîsta ku di bin wî re dest pê dike, dirêj dibe û diçe.

Ezmanekî şîn û sayî, di bin şewqa tirêja rojê de wekî hinekî çilmisibe xuya dibû. Li aliyê Bendava Kebanê yê din û li Elezîzê de dawîya baregeha xetê de ewrê rengê xweliyê kom bi kom hebûn, li tenê li xeta hemberî wan tazî, şên bû ku rihetî dida mirovan. Hemû xweza çûk, kêzik bédeng bûn. Mîna temaşevanên ku bêsebir û heyecan li hêviya vekirina perdeya sahnê sekinî bin, li benda listika ku wê dest pê bike bûn. Ew listika çend caran hatibû listin, cara yekemîn diguherî, listikvan û temaşevan cihê bûn. Lê belê karktêrên listikê bi inad e. Tiştê ku çend hezar sal bû nediguherî, yê xwînxwar û yê xwecihî bû, bi gotineke din yê zalim û yê mazlûm bû.

Bi derbekê re nepixîbûna dilê xwe hest kir. Çavên wî dibirîqîn. Awirê wî tûj bûbûn, gir û kîna hezar salan hatibû di nava destê wî de civiyabû. Di nav wan darên li hemberî wî de, çend leşkerên dijmin derketibûna, wê kîna xwe bi wan de verişiya û rihet bibûya. Ew pêş jî wekî kewanê dirêjkirî kişandî, di bedena wî de sekiniye, ji niha ve hinek hestên germ hişyar dikirin. Demekê hindik be jî ew hebekî rihet kiribû.

"Hevalê Şoreş xwe amade bike, em diçin" bi vî dengî tam xwe rast kiribû, ji nişkê ve dengê vizeviza guleyên ku ber bi ezman bilind dibûn û dengê roketa wekî tavên ber bi cihê ku ew lê ye dihatin, li ser vî yekê wî xwe avête erdê. Şer dest pê kiribû. Dengê çekan de olan dida. Bi îsareta hevalê xwe bi jîrî, bi sivikayî jî

cihê xwe rabû rast bû û dest bi meşê kir. Meşa wan bi demeke kurt, bi qelewîska berde-wam kir. Mîna listikekê xuya dikir. Listika ku niha tê listin û di dawîya wê listikê de hinek ji wan jî sahnê derdiketin ku careke din nîkaribin bi paş ve vegehin sahnê. Di dilê xwe de derbas kir ku "Divê ez ne ew bim" wî jî wekî hemû mirovan di navê listikê de cih digirt. Lê ew wekî mirovên ku senaryoya vî listikê biguhere û ji nû ve binvîsîne bû. An tê wê senaryoyê qebûl bikî, kîjan rola ku li te dikeve divê tu ji bo wê bixebitî an jî tê wan qebûl nekî. Tevlî nivîsîna senaryoyeke nû bibi.

Hêz da xwe ku rabe bimeşe, destê xwe mîna şeh xebitand. Pelçimîna ku ketibû ser eniya wî ber bi jor de tewand. Mîna her car dev û rûyê wî lewaz bûn. Arguşkê wî çûbûn xwar, çavên wî bûbûn koncal, pozê wî li gorî rûyê wî hinek mezin di nava rûyê wî de xuya dikir. Her du çavên wî mîna dû zeytûnên reş û birûhên wî qalind û reş ji dûr ve dihat nasîn. Li gorî lawaziya dev û rûyê wî, bedena wî hinek dagirtî bû. Di nav şerwalê botanî de dema ku şapik û şalên xwe bi ser de girê didan parkeyê leşkerî bi ser wan de li xwe dikir, bejna wî mîna Çiyayê Munzurê bi heybet xuya dikir.

Dengên tivingan û vizîna berikan di ser wan re derbas dibûn. Lê baş nizani-bûn bê ew deng ji ku ve tê. Wisa fêmkirin ku dijmin ew ferq nekirine. Lê ji dengê vizîna berikan dihat fêmkirin ku hinekan li pala nependî wan li hev xistine. Di nav dijmin û hinekan de şer çêbûye. Gelo ew di nav dijmin û hevalên wan de çêbûye? Lê ji wê bi xwe ne bawer bûn. Lewre di wê qadê de gerilayên çepên tirkên jî li wan deran hebûn. Ên ku bi dijmin re şer dikirin kî dibin bila bibin wê demê xwe di şûna wan de diditîn. Serkeftin ji wan re dixwestin. Bi qasî ku wî fêmkirin ew ji qada şer bi dûr ketibûn. Ji paş ve jî bi qasî mangayekê hevalên wî mabûn.

Dema rabûn ku dîsa bimeşin di dilê wî de acizbûnek çêdibû ku ewqas nêzikî şer bûye û tivinga xwe nexebitandîye, lê ew şaş meh bûn ku di nav hêzên gerila de bû. Perwerdehiya siyasî ku zivistanê ditibû jî bo ku di qada leşkerî de ango di karwanîyê de bêzmûniya xwe, ji ser xwe biavêjin, bû. Dilê wî tim bi germî lêxist. Tiştên ku herî pir xeyal dikir, bêhna barûdê wekî ku tim di pozê wî de be û



bikşîne kezaba xwe û lûlê tivinga wî ya ku di şer de sor dibe destê xwe li ser bixê û pê şa be. Tiştên ku ew dixistine nava wan xeyalan ew bûn. Lê ew di nav hevalên xwe de bédeng, giran, dilovan, ew bi dilnermiya xwe ku nedixwest êşê bigihîne gêrikekê di nav hevalan de wisa dihat nasîn.

Dema rêzname girt ku "Heval bila lez bikin" bi bédengîya xwe û bi lezgîniyê ku xeber gihande hevalên dawî. Dîsa heycaneke mezin di dilê wî de peyda dibû. Di wê navberê de pir wext derbas nebû, ji nişkê ve pêşwazî gulebaraneke dijwar bûn ku mîna baranê bi ser wan de dibariya. Li pêşberî wê gulebaranê xwe navê erdê. Li gorî rêznameya ku girtibûn bêhtir şidandî û bi lez dimeşiya. Lewre dijmin ew ditibûn, cihê ku lê bûn li wir nedihatine parastin cihêkî ne xweş bû. Li hawir dora wan vizîna berikan bû. Hinek vizîna berikan kêmkirî jî nişkê ve wekî ku derziyek li bin kapaxê çonga wî keve jan jê çû. Pêşî deng nekir, tiştê negot, gavek du avêtin, gava sisîyan dema lingê xwe bilind kir ku gava xwe biavêje xwe li erdê dît. Wî jî nizaniyê ku çawa çêbûye. Çonga wî ya ku berî niha jî çûbû bêhemdê xwe destê xwe bi hêdîka bire ser. Birîndar bûbû, ji bin çalçaxa çonga wî xwînek şirgerm dinuqûti. Wisa di cihê xwe de mabû sekinî, li çonga xwe ya birîndar dinihêrî.

Ji nû ve gulebaraneke xanavkî dest pê kiribû û kêmkirî hevalên wî xwe diqelizandin niv tewandî û bi bez di ber wî re derbas dibûn. Yekî ji hevalên wî re digot: "Çi bûye bi helvalê Şoreş" Şoreş heval bi dengêkî nizim bersiv da got: "Ez birîndar im" Hevalên wî ku di ber re baz didan di serê wî ramana ji nû ve meşinê hişyar bû. Carekê dido di cihê xwe de xwest ku rabe ser piya lê belê her cara ku dikir rabe ser xwe lingê wî yê rastê jî ber kaboke û berjêr nedigirt. Ji neçarî careke din diket erdê. Niqutandina xwîna şir-

germ berde-wam dikir. Destê xwe careke din dirêjî birîna xwe dikir. Destê xwe yê rastê wisa li ser devê birîna xwe digeland. Peyva "pijîliye" bêhemd ji devê wî derket. Tê gîşk ku hestiyê çoka wî pijîliye. Lewre ew bi xwe bijîşkê veterineriyê bû. Wekî brûskê di mêjiyê wî de dijenî. Fikra ku ew dikare bimeşe mîna çengelekî zingargirtî di dilê wî de çikiyabû. Jana wî pir zêde dibû. Êdî guhê wî nedibihîst, çavên wî li hevalên ku ber re diborîn diket. Peyva ji mirinê afirandina jiyane bi xwe ji devê wî derket. Wê êş û jana xedar ew bi hişê wî ve anî. Bihîskirîna hatîna reperepa dengê lîngan re serê xwe zivirand. Dît ku du hevalên wî ber bi wî bi lez û bez tîr, yek ji wan ê ku dihat hevalê wî Simko bû û li dûv wî jî Botan baz dida. Dema herdukan di ber re bilez beziyan Simko deng lê kir: "Em paşîvan in heval, ji me û şûn de kes nemaye. Tu jî rabe ser xwe"

Simko hinek jê bi dûr ketibû. Şoreş gazî wî kir: "Heval ez birîndar im" Simko di dilê xwe de digot gelo min rast bihîst? Li Şoreş vegeriya rewşa ku Şoreş tê de bû ew şaş û mat kiribûn. Şoreş devê tivinga xwe dabû binê zeniya xwe û sekinibû. Simko qêrînek da. "Na heval!" şaş û mat mabû. Lê berî ku ew tetikê bikişîne got: "Hûn xwe xelas bikin, heval!", bi carekê re ewr tarî bûn, Simko çok dabûne erdê û sekinî bû di nav vizeviza berikan de. Botan li Şoreş dinihêrî ku Şoreş li erdê dirêj bûye, lê di cihê xwe de ma sekinî

Wekî ku hemû tişt qediyabe. Dengê çekan bi tevahî hate birîn. Simko û Botan wisa di cihê xwe de mabûn sekinî. Hevalê wan yekî din jî li ber çavên wan li şer çiyayê Kurdistanê hêdî hêdî bilind dibû û cihê xwe yê li ezmanên li nav me-diyan di nav stêrkên pekrawan de digirt. Êdî ew bi temamî ji hev û dun veqetiyabûn.

Ş. BAŞTİMAR



- 11.05.1992: Hunermend û şoreşger Mizgîn (Gurbet Aydın), li Tatwanê şehîd ket.
 - 11 Gulan: Roja dayikan tê pîrozkirin. Ew roj ji sala 1915'an û vir de her sal bi navê roja dayikan tê pîrozkirin.
 - 16.05.1926: Destpêka Serhildana Çiyayê Agirî.
- Cara yekemîn, hêzên dewleta tirk û hêzên kurd li Çiyayê Agirî dest bi şer kirin. Di sala 1926'an de, Biro Teli Hesikî li Çiyayê Agiriyê (Ararat) li dijî dewleta tirk dest bi serhildanê kir. 5.10.1927'an de li derveyî welat rêxistina 'Xoybûn' hate damezrandin. 'Xoybûn'ê, têkilî bi Biro Teli Hesikî re danî, Ihsan Nûrî Paşa jî kir berpirsiyarê leşkerî û bi hêzeke mezin ve

ji bo alîkariya Biro Teli Hesikî şand çiyayê Agirî. Di bin serokatiya Biro Teli Hesikî de hikûmeta Agirî hat damezrandin, di programa hikûmeta Agirî de bi tenê serxwebûna bakurê Kurdistanê hebû. Hikûmeta Agirî di nav şoreşê de kovarên 'Agirî' û 'Gaziya Welat' derxistin. Hikûmeta Agirî di bin şertên gelekî dijwar de heta sala 1931'î li berxwe da. Hêzên kurd bi serokên xwe ve xwe nedan dest, di dawiyê de çeperên şer şikandin û derbasî Iranê bûn. Bi vî awayî hikûmeta kurd a Agirî têk çû.

- 17-18.05.1982: Çar şoreşgeran Ferhat Kurtay, Necmî Öner, Eşref Anyık û Mahmut Zengin, li Girtîgeha Amedê ya leşkerî ji bo protestokirina zilmê xwe şewitandin.

AWIR

Parêzer Eren Keskin:
**Dijberiyeyeke
rasteqîn pêwist e**



Di bin rêberiya Parêzer Eren Keskin de roja 3'yê gulane malbatên windahiyan li NÇM'ya Stenbolê panelek li dar xistin. Ev panel bi mebesta salvegera duyemîn a çalakiya "malbatên windahiyan" pêk hat. Rêvebera Komeleya Mafên Mirovan ya Stenbolê Parêzer Eren Keskin li ser serkeftina malbatên windahiyan kêfxweşiya xwe anî ziman û malbatên ku ew 102 hefte bêrawestî her roja şemiyê rûdinin pîroz kirin. Her wiha Keskin diyar kir ku ew ji beşdarî gotina bi rengê "Divê krîz bê navneteweyîkirin" dibe. Parêzer Keskin di sa da zanîn ku malbatên windahiyan ev serkeftin bi hêz û biryardariya xwe bi dest xistine. Wê li ser sersariya mirovên ku xwe wekî dijber didin nasîn jî wiha got: "Yên ku xwe mîna muxalîf didin nasîn, gelo bi rastî muxalîf in? Eger însanên tirk derkevin kolanan û bêjin em aştîyê dixwazin, wê ev şer xilas bibe. Jixwe pîrsgirêka me ya şerke jî ev e ku emê çawa bibin xwediyê tevgereke dijber a راستeqîn."

Ji panelvanan, diya Hüseyin Morsümbül Fatma Morsümbül û bavê Hasan Ocak Baba Ocak serpehatî û çîrok revandin û qetilkirina zarokên xwe ji guhdaran re vegotin. Fatma Ocak bang li dayikên polîs û leşkeran kir û wisa berde-wam kir: Werin em tev vî şerî bidin sekinandin, bila leşker û polîs nemirin, yê ku ji aliyê dewletê ve tîn kuştin hemû mamoste ne, textor in (bijîşkin), parêzer

in; bila çapemeniya azad bê, bila rewşenbîr û dayikên leşkeran bigihîjin hev û vî şerî bidin sekinandin.

Bavê Hasan Ocak Baba Ocak jî diyar kir ku ewê vê êşê heya bigihîje teyrên li ezmanan û gêrikên li erdan, ji her kesî bibêjin. Baba Ocak li gorî hin agahdariyên ku wan bihîstine wiha got: Notirvanê (bekçi) goristana windahiyan gotiye ku çar caran polîs tîn ji me cih dixwazin û laşan vedîşêrin.

Birayê Rıdvan Karakoç Hasan Karakoç jî diyar kir ku li Tirkiyeyê heya ku însan bi êş û janan re rû bi rû neyên ew êş û derdên wan his nakin û wiha berde-wam kir: "Ne tenê malbatên leşker û gerîla vî şerî dijîn, berî ku dor bê we li dijî şer derkevin." Her wiha Hasan Karakoç got ku îro Kurdistan bûye mîna Almanya dema nazîyan, OHAL bûye odayên gazê yê wê demê. Wî got ku her wekî çawa rejîma faşîst a di bin serokatiya Hitler de însanên li dijî rejîma xwe dikuştin, dewleta tirk însanên bijarte dikuje; yê ku hez ji însanan dikin û li nik mirovahiyê ne. Panel bi axaftina guhdarên ku hest û ramanên xwe anîn ziman, xilas bû. Ji panelê ev encam derketin: Divê çalakiya Malbatên windahiyan li bajarên Kurdistanê û metropolên din jî pêk bînin, pêwist e ku hunermend û rewşenbîr bi piranî yê tirk piştigiriya xwe zêdetir bikin û divê muxalefeteke راستeqîn pêk were.

SEVDA ELDEMİR

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



"Osmaniyê bêdîn,
talanker û diz"

Di van rojên dawiyê de her ku diçe êdî baş xuya û eşkere dibe ku ne Erbakan û Çillerê, lê hikûmeta İsmail Hakkı Karadayî û ya Çevik Bir Tirkiyê îdare dike. Berê jî wiha bû, lê ev bi dizî li pişt perdeyê dihat kirin. Dema hinek kesan digotin "Li Tirkiyê esil hikûmet Konseya Ewlekarî ya Neteweyî (MGK) ye," partiya Tirkiyeyê ev yek qebûl nekirin û digotin: "Li Tirkiyê demokrasi heye. Meclîs dixebite, hikûmet li ser kar e, kurm û gumra partiyên e û organên qanûnî û yê birêveberiyê wekî ar dixulin. Çerxa demokrasîyê dixebite. Ev hemû propagandâ û buhtanên dijminê demokrasîyê ne, yê parvekar û terorîstan in, yê ku ji derve dixwazin îtibara Tirkiyeyê bixin..." û hwd.

Lê, niha her tişt pir vekirî, zelal û eşkere ye. Biwêjeke kurdî heye, dibêjin 'filan kes çû ber tirên çeşikan.' Yanî êdî ji tiştêkî re nabe, ji kar û cihê xwe hat avêtin. Belê ev gotin niha tam ji bo Serokwezîr N. Erbakan û alîkara wî T. Çiller mirov dikare bi kar bîne. Yanî Erbakan û Tansu 'çûn ber tirên çeşikan.' Serokfermandarê duyem ê Tirkiyeyê Çevik Bir rojekê li Amerîka, rojekê li Belçîka û rojêke din li Îsraîl rasterast têkilîyan datîne û li ser polîtîkaya Tirkiyeyê daxuyaniyan dide çapemeniya Tirkiyeyê û cihanê. Panel û brîfîngan li dar dixê. Mesajên siyasî dide. Ev ew qas eşkere bû ku êdî delegasyonên ewrûpî dema diçin Tirkiyeyê di şûna serokwezîr û endamê hikûmetê de, ew diçin Çevik Bir û hevalên wî yê esker ziyaret dikin û li ser pîrsên, civakî, siyasî û eskerî bi wan re diaxivin û biryaran digirin.

Êdî ewrûpiyan jî baş fêm kiriyê ku li Tirkiyeyê hikûmet wekî sekreteriya eskeriyê kar dike. Yanî wekî memûrê eskeriyê ne û memûrtiya xwe dikin. Tu fonksiyoneke serokwezîr û wezîran tune ye. Organa ku dewletê îdare dike eskerî ye û ji ber vê yekê êdî delegasyonên biyan direkt têkilîyê bi vê organê re datînin.

Niha hikûmet li ser kaxîzê heye, di pratîkê de tune. Di pratîkê de Konseya Ewlekarî ya Neteweyî heye. Ew bi Amerîka û Îsraîlê re peymanên qirkirina kurdan pêk tîne. Stratejiyên eskerî yê hevkar çêdike û di ser de jî ji serokwezîr N. Erbakan re çêran (xewer) dike.

Erbakan dema li muhalefetê bû li dijî Amerîka û Îsraîlê daxuyanî didan û di her axaftina xwe de li dijî emperyalîzma Amerîka û siyonîzma Îsraîlê derdiket. Îqtidar bi têkilîyê Amerîka, Îsraîl û ewrûpiyan re sêcdar dikir. Û digotin ku "ew endamê klubên ewrûpî ne." Lê, niha dema ku ew serokwezîr e, li dijî dewletên ereb û misilman Çevik Bir bi Îsraîl û Amerîkayê re peymanên tatbîqatên leşkerî pêk tîne. Mucahit Erbakan çima deng ji te dernayê? Gelo te bi dua û pîfêkirinê kurd û ereb kirin siyonîst û emperyalîst, Îsraîl û amerîkî jî kirin musilman? Ma marîfetên te yê wiha jî hene he? "Seni gidi seni" Osmanlı dînsîzi, talancı hürsîz!... (Hey gidî osmaniyê bêdîn, talanker û diz!)

Belê, Erbakan û Refah partiyeye osmanî ne. Armanca wan di bin perdeya musilmantîyê de dixwazin carekê din bejên Asya, Afrika û Ewropayê dagîr bikin. Li ser navê musilmantîyê talan, wêran û barbariya tirkan li Rojhilata Navîn jîndar bikin. Bi taybetî li ser navê musilmantîyê kurdan dixapînin. Ew jî baş dizanin ku êdî ne Erbakan û ne jî kesekî din dikare li ser navê musilmantîyê welatekî din dagîr bike. Lê qet nebe têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê sist bikin, an jî rawestînin. Armanca Erbakan û Partiya Refahê ev e. Ev di nav 10-11 mehan de baş diyar bû.

Kemalîst li ser navê layîkîzm û demokrasîyê kurdan înkâr dikin, zilm û kedxwariyê xurtir dikin; Erbakan û Refah jî li ser navê misilmantîyê eynî polîtîkayê didomînin. Ferqa kemalîst û musilmanên tirk ev e. Gotîneke kurdan heye, nivê wê bi kurdî û nivê wê jî bi tirkî ye, tam li gorî vê rewşê ye: "Dîms û bekmez (pekmez), ferq (fark) etmez. Dîms dîms e û bekmez jî kefa li ser e." Belê Erbakan kefa li ser e.

Refîq Sabîr kî ye?

Refîq Sabîr yek ji şairên kurd e ku bi kurmanciya jêrîn dinivîse. Ew di sala 1950'î de li bajarê Qeladizê ji dayik bûye. Xwendina xwe ya li ser edebiyata kurdî li Zanîngeha Bexdayê qedandiye. Di salên heştîyan de li Bulgarîstanê bawernameya (diploma) doktorayê bi dest dixe. Lê berî doktoraya xwe di sala 1979'an de li Kurdistanê vedigere û bi Partiya Komünîst a Iraqê re wekî pêşmerge li çiyayên welêt dixebite. Lê piştî demekê dilê Refîq Sabîr ji wan sar dibe. Refîq Sabîr heya niha heşt pirtûkên helbesta weşandine. Ew wekî yek ji wan şairên kurdku piştî 1970'yî li başûrê welat helbestên kurdî ber bi nûjenbûnê ve birine, tê jimartin. Niha sernivîskarê kovara Rabûnê ye ku ji sê mehan carekê li Swêdê



Her helbestek rengekî taybet e

Destpêka helbestvaniya we li ku vedigere û ji ku dest pê dike?

● Despêka yekemîn li salên dawiyên 1960'an vedigere. Hingê ez xwendevanê dibistana amadeyî (lîse) bûm li Qeladizê. Ji xeynî xwendina xwe ya dibistanê, ez bi germî mijûlî xwendina helbest û edebiyata kurdî bûm. Bi xwendina helbestê hesteke taybet û hejandineke ruhî li cem min çêdibû. Min hest dikir ku helbest min ber bi azadiyê ve dibe. Min dixê cihaneke ji wê cihana sext û dijwar ku şerê dewleta Iraq û Kurdistanê pê ve zeliqandiye, cihê ye. Di wan deman de bû min dest bi nivîsandina helbestan kir. Helbestên ku min di wan deman de nivîsîn, zêdetir lasayiyên (teqlîdê) şairên mîna Wefayî û Goran bûn. An jî derbirîna hesteke jar bûn, li beramberî bûyer, jiyana û evînê. Her çiqas ew helbest di aliyê de hunera edebî qels bûn jî, lê ji bo min ji cihana nivîsandinê re pîrek bûn. Ji wî jî girîngtir destpêkek bûn heya ku biwêrim (xîret bikim) bi rêka peyvnan, hest û nêrînan xwe beramberî jiyana, siruşt, evîn û mirovan eşkere bikim. Yanî hestan bi desthilatî û girîngî binim zimên.

Ji sala 1970'yî û bi vir de guhartineke nû di helbesta kurdî (li çêbû, hûn dikarin bi kurtasî behsa wê guhartinê bikin?)

● Heya sala 1970'yî di helbesta kurdî de (li başûrê Kurdistanê) di çar-

çoveya wê nûkirinê de bû, ku Goran di salên 1930'yî de di helbestê de çêkiribû. Goran zimanê helbesta kurdî, form û naverok bi tevayî guherand. Di cihê kêşa erûz a erebî de, (kêşa helbestên klasîk ên kurdî hemû li ser wê kêşê ne ku ew jî ya ereban e) cara yekemîn kêşên ku di helbestên folklorî û helbestên Hewramî de dihatin bikaranîn, ku bi kêşa 'Sêlab' hatine naskirin, bi kar anî. Her wiha di cihê zimanê tijî bi peyvên

heya sala 1970'yî helbesta kurdî di çarçoveya nûkirinê de bû, ku Goran di salên 1930'î de di helbestê de çêkiribû. Goran zimanê helbesta kurdî, form û naverok bi tevayî guherandin. Di cihê kêşa erûza erebî de, cara yekemîn kêşên ku di helbestên folklorî û helbestên Hewramî de dihatin bikaranîn, ku bi kêşa 'Sêlab' hatine naskirin, bi kar anî.

erebî û şeweyên taybetmendiyên helbesta klasîk, ku bi bardora edeba farisî û erebî derbasî zimanê kurdî bûbûn, zimanekî sivik ê kurdî û tijî wêneyên realîst ên zelal, lê kûr û têrware, anî nav helbesta kurdî. Ew wêneyên şifirî jî gelek ji siruşt û rojevê re nêzik bûn. Lewma di naveroka helbesta kurdî de, guhartineke kûr û pirwate çêbû, baskirina siruşt, bedewî, jin û jiyana civakî ya xelk bi şeweyekî berfireh derbasî helbesta kurdî bû.

Helbestavanên piştî Goran heya sala

1970'yî di bin bandora Goran de bûn. Pir an hindik, di bin bandora wî de helbestên xwe dinivîsandin. An bi wateyê ke din me Goran hebû di lûtkeyê de û şairên din jî li dora wî dizivirîn. Lê belê ew şeweyê nû yê helbestî berî mirina Goran (1962) erk û karê huneriya xwe qedandibû. An jî cureyek dubarekirin girtibû nava xwe. Di dirêjîya salên 1960'î de jî ji sedemê şerê li Kurdistanê, fersend nîn bû ku helbest û edebiya-

ta kurdî xwe bixe nav bizaveke wisa.

Ev tişt berî 1970'yî bûn, piştî wê demê çawa bû?

● Di sala 1970'yî de ku aştiyê ka-tî (demdemî) li Kurdistanê çêbû, bizaveke fireh a edebî û kulturî dest pê kir, gelek kovar û rojnemeyên kurdî hatin weşandin. Êdî destpêka nûjenbûneke din di edebiyata kurdî de dest pê kir. Di wê demê de nîşekî nû ji şairên kurd derketin, ku piraniya wan jî di siya şer de mezin bûbûn. Wan şairan hewl dan

xwe ku bi teknîka nû û hemdem helbestan binivîsin, behsa daxwaz, xewn û azarên mirovên kurd ên di siya şer de bikin. Di wê demê de komek dengên nû, di helbesta kurdî de derketin ku helbestê her yek ji wan xwediyê taybetiya xwe bû û tê de destpêka nûkirinê hebû. Van şairan berevajî şairên berî xwe (şairên 1940'an û 1950'an) karibûn ji bin bandora Goran derkevin, şewe û stîleke cuda ji stîla Goran biafirînin. Guhartineke nû di zimanê helbestê de çêbû. Bi sedan û hezaran peyvên nû ketin nav helbesta kurdî. Wêneyê şifirî, teşbîh, metafor şeweyên cihêreng bi xwe ve girtin. Sembol bi şeweyekî berfireh derbasî nava helbestê bûn. Nêrînê ji bo helbestê pîvaneke din ji xwe re dît. Her wiha naverok û mijarên nû hatin nav helbesta kurdî. Baskirina aliyê ruhî di mirov de cihêkî berbiçav girt di helbestvanên nû de, ku ez jî yek ji wan im. Ev nûjenkirin jî aliyekî ve berdewarî wê nûjenkirinê ye ku Goran da despêkirin, lê di demeke din de û bi şeweyekî kûrtir û berfirehtir. Ji aliyekî din ve jî xwe veqetandin e ji Goran, ji ber ku bizav û diyardeyê nû ya helbestê ye û hemî reng û taybetmendiyên wê bi xwe hene. Ez dikarim bibêjim ku niha helbesta kurdî ji stîla Goran temam cuda ye. Gelekî nêzikî stîla modern a ôhanê û bi taybetî ji helbestên ewrûpî bûye. Helbet tevî taybetmendiyên (xususiyetên) xwe. Ev bizava helbestî he-

ya niha ji berdeyam e. Her çiqas ji hinek ji wan şairan ji zû ve dev ji helbestê berdane ji. Hineke din ji wan her bi stîla salên 1970'yî helbestan dinivîsin. Lê belê di salên 80'yî û 90'yî de ji, helbesta kurdî bi berdeyamî deng û rengên nû derdixê holê ku rêl didin pêşveçûn û dewlemendkirina helbesta kurdî. Diyardeya pir-dengî û pir-rêngî di helbesta kurdî de zêdetir bi cih dikin.

Niha li Başûr her çiqas ji wekî hemû aliyên jiyana kulturî, siyasî û civakî helbest ji rastî qeyran (krîz) hetîye, lê hê ji berê helbesta kurdî ber bi geşbûnê ve ye, di nav wê diwarîyê de rîya xwe dikudîne her çiqas hêdî be ji.

Hunê bikarin zêdetir qala diyardeya pir-rêngî û pir-dengî ya helbesta nû ya kurdî bikin?

● Di destpêka 1970'yî û bi vir ve helbesta kurdî ji diyardeya yek rengî, yek dengî û yek melodî derbas bûye. Êdî helbesta kurdî ji wê rewşê derbas bû ku kurd di her pêvajoyekê de bi tenê yek şairê wî yê baş hebe û şairên din li dora wî bizivirin, bişibin wî û baştirîn şair ji ew be ku kemtirîn bandora wî li ser be. Mînak weke serdema Goran (1905-1962, an Nalî (1798-1856) di şedsala 19'an de.

Îro di helbesta kurdî de diyardeya pir-rêngî û pir-dengî gelekî xuya ye. Her şairekî/e afirîner bi rêka xwe, bi şeweyê xwe yê taybet berdeyamîyê dide afirandina helbestê. Heke ku di destpêka salên 1970'yî de wê diyardeya pir xuya bal neşandibe, îro bi şeweyekî zelal xwe dide xuyan.

Ev ji bi tenê ji bo şairên nîşa me derbas nabe, her wiha ji bo şairên ku piştî me ji tîr her wisa ye. Îro pir-dengî bûye aliyê herî xurt di helbesta kurdî de. Bo nimûne eger em li helbestê van şairên mîna Lîfîf Helmet, Şêrko Bêkes, Ebdûla Peşew, Ferhad Şakelî û Refîq Sabîr binêrin, emê bibînin ku her yek ji wan dengêkî bi temamî ji yê din cihê ye. Heman diyarde di helbesta 1980'yî de tê ditin. Bo nimûne helbestên Celal Berzicî tewaw ji Kerîm Deştî, an Qubadî Celîzade, an Xebat Arîf cuda ne. Ehmedî Mela, Bextiyar Elî, Ferhad Pîrbal û Sebah Rencder û hwd. her yek ji wan dengêkî serbixwe ye û ew giş bi tamamî ji hev cihê ne.

Ji van şairan û yê din jî, eger mirov hinek xemên hevbeş ên mirovî, neteweyî û hinek peyvên hevbeş jê biavêjî, helbestên kesekî ji wan helbestên din nagire. Ev serwerîyê mezîna e ji helbesta kurdî ya îro re. Lewre ew nîşana resenî û cihêrengiya çavkaniyên rewşenbîrî ye; nîşana hewildana berdeyamî ya van şairan e ji bo pêşxistina teknîk, hunera helbest û gerê li dû afirandinên nû. Her ew wiha nîşana hemdem-bûna helbest û nûdemîya jiyana me ye. Lewma bêhaybûn û nezani ye eger îro rexnegirek an rewşenbîrêkî din nav neviyêke şîrî de bi tenê yek an dû şairan dibîne. An jî berhemên şairekî, du şairan tomar bike. Bi tenê şeweyê helbesta vî û wî şairî nabe pîvan û mînak bi tenê ji nûjenbûnê re. Lewre wê pir-dengîyê derfeta geşekirina çêjen (tamên) cihêreng li nik xwendevan çêkirîye. An

bi wateyeke din beşdarî ji hesta ciwan-nasî li cem xwendevan çêkirîye. Ev diyardeya ku ji zû ve di nav helbesta gelên din de serihildaye, îro jî bi şeweyekî berfireh di helbesta kurdî de tê ditin.

Helbest, ezmûnên (tecrûbe) pêşmerge-tiyê û çiya?

● Dema ez bûm pêşmerge bi hêvî bûm wekî nivîskarekî xizmetekî bigihînim şoreş û welatê xwe. Her wiha min texmîn dikir ku di siya şoreşê de ezmûna min a şîrî jî dewlementir dibe, wate şoreş jî bizavekê dixê ber ezmûna helbest û afirandina min.

Di dîroka wan gelên ku xebata rizgariyê kirine de mînakên gelekî erênî (pozîtîv) di vî warê de hene. Lê xebata çekdarî li başûrê Kurdistanê bi dirêjîya 30 salî nikaribû geşbûnekê di edebiyata kurdî de çêbike, an jî edebeke niv-şoreşger biafirîne. Ev yek jî naveroka şoreşê bi xwe dixê berpirsiyariyê. Gelo ev xebata çekdar bi rastî jî şoreş bû an bizaveke çeteyan û eşîretan û paşverû bû ku di siya wê de ne cihê fikir, ne cihê şaristaniyê (medeniyet), ne jî cihê çand û helbestê tunebû û tu car jî cihê wan nabe.

Di sala 1979'an de min dev ji xwendina xwe ya li Ewrûpayê berda û ez li Kurdistanê vegeyîyam, heya ku di xebata çekdariya gelê xwe de beşdar bibim. Li wir digel çend hevalên din me yekîtiya nivîskarên Kurdistanê ava kir. Kovara "Nivîskarê Kurdistan" me weşand ku organa wê yekîtiyê bû. Her wiha me çend pirtûkên edebî weşandin.

b i taybetî li başûrê Kurdistanê bi dirêjîya 30 salî nikaribû geşbûnekê di edebiyata kurdî de çêbike, an jî edebeke niv-şoreşger biafirîne. Ev yek jî naveroka şoreşê bi xwe dixê berpirsiyariyê. Gelo ev xebata çekdar bi rastî jî şoreş bû an bizaveke çeteyan, eşîretan û paşverû bû ku di siya wê de ne cihê fikir, ne cihê şaristaniyê, ne jî cihê çand û helbestê tunebû.

Hingê şerê birakujî di navberê hêzên başûrî de heya dihat zêdetir dibû. Me gelek hewl da, da ku wekî nivîskarê neteweyêke bindest û welatdagirkirî, bibin sedema biratî û lihevhatinê, lê bê-sûd (feyde) bû. Bûyer gelekî jî wê tehlîr bûn ku bi nivîskaran werin çareser-kin. Dema çek dibe zimanê peyvîne-kî guhdarî nivîskaran dike. Paşî di havîna 1992'an de, ez ji Kurdistanê derketim û min berê xwe da Bulgaristanê da ku berdeyamîyê bidim xwendina xwe. Lewre hebûna min li Kurdistanê tijî bi şerê birakujî ne tenê bê-sûd bû, her wiha hereşe (tehdîd) li ezmûnê helbestê û geşbûna min a edebî jî dikir.

Hûn ji wê neviyê ne ku têkçûna şoreş-şar rezberê (1961-1975) bandoreke mezin kir li ser helbest û berhemên we, wê yekê paşê çawa li nik we reng veda?

● Nizanim gelo wê karesatê (trajedî) bandora mezîna li helbestên min kir an na, lê têkçûna bizava çekdarî ya rezberê di 1975'an de, karesateke neteweyî bû. Lewre piştî 14 salên şer û xwînretî-nê, di demeke de ku bizava kurd li wir cihê hêviya hemû-gelê kurd bû, lê belê

wisa hêsan têk çû. Ev destpêka dîroke-ke pir tirajîk bû ji bo gelê Başûr, bi ya min heya niha jî em jê derbas nebûne. Ev tirajediyê ku niha li Başûr dibînin, giş berdeyamîya heman tirajedî ye.

Wê rewşa nû bi şeweya cihêreng di edebiyata kurdî de deng vedaye. Wê bûyerê hinek nivîskar ber bi reşbînî û bêhêvîbûnê ve birin. Hinekên din jî ber bi hejanê ve birin. Bûyerê pirsîyareke bi derbest (cidî) der heqê naverok û hê-jahiya bizava Başûr û sedemên têkçûna berdeyam a wê bizavê de anî holê.

Gelo ev karesat çawa di helbestên min de xwe dide nîşandan, an çiqas wekî meseleyêke şîrîreng vedaye, bi ya min baştir e ku ez wê yekê ji rexnegiran re bihêlim.

Helbesteke herî dirêj ku ji bo Helebçe hatibe nivîsandin, bi ya min "Lawikî Helebçe" ye, aya (gelo) dikarin bas ji ji dayikbûna wê helbestê bikin?

● Peywendîya wê helbestê bi karesata Helebçeyê re heye ku lûtkeya karesatan bû, ku di siya dewleta dagirker a Iraqê de hat ser gelê Kurdistanê. Trajedi bi cureyekî sext û kêr wêne bû, wekî mirovek min şerm dikir ku ez di serdemek wiha de dijîm ku hê jî rê di-din hovîtiya bi vî şekî. Her wiha wekî kurdekî ku ev tirajedî hatiye serê neteweya min bi xwe, min kurtir hest kir ku em rastî çî çarenivîsê hatine. Di jiyana xwe de tu carî bi qasî rojên karesata Helebçeyê, min hest bi bêwateyiya ji-yanê û bêrûmetiya nîrxa mirov nekiri-ye.

formeke hunerî guncaw (munasîb) de, di rêka behskirina tirajediyêke insanî de, êşa neteweya xwe û xema xwe wekî mirovekî û wekî kesekî bêwelat bixim nav çarçoveya helbestê. Her wiha heya ji min hatibe, min xwestiyê ku xwe dûrî qîrîn, slogan û diruşman bigirim, zêdetir di rêka wêneyên şîrî, metafor (mecaz) û anîne ber çavê şîrîya-neyê komelek dîmen û bûyerên ku min di dema zaroktî û pêşmergeyêtiya xwe de ew ditîbûn, her wiha tijîkirina bîr û hest, xeyalên xwe behs ji wan tiştan bikim. Min xwestiya tîrêjê bixim ser aliyê ruhî ya mirov, ne ku wesfa aliyê siyasî yê trajediyê bidim. An jî di wate-yeke din de min xwestiyê ku behsa bandora wê karesatê li ser mirovahiya mezin bikim û hest û hejana xweya ruhî bînim zîmên. Ne di nivîsandin û ne jî di weşana wê helbestê de min lez nekir, wê jî derfet da min ku ez hinekî hêmin ji bûyereke na hêmin û dijwar ramînim. Her wiha min karibû ku piranî wan beş û hevokan ku aliyê wan î şîrî jar bû, an jî muhira siyasî bi wan ve xuya bû, bi-avêjim.

Hûn dikarin behsa kovara Rabûn û karê rojnamevaniyê li Ewrûpayê bikin?

● Ev dibe şeş sal ku em li Swêdê wê kovarê derdixin, bi armanca ku di pêş-xistina bizava çandî ya derveyî welat de beşdar bibin. Her wiha bi armanca ku hinek nêrînen nû der heqê mesele-yên ramani, çandî û rewşenbîrî de bixin pêş çav.

Karê rojnamevaniya li derveyî welat pir dijwar e. Dijwarbûna jiyana li vir rê nade ku mirov wekî karê rojane rojname-vaniyê bike, bi ya min ev jî beşek e ji derdê bêwelatiyê.

Her wiha kurdên li derveyî welêt, (gotina min ji bo Başûr û Rojhilat e), kêr dixwinin. Hiç kovareke kurdî du sed heb jê nayê firotin. Kêr pirtûk he-ne sêsed heb ji wan tene firotan, meger nivîskarê pirtûkê bi partiyeke re be û partiya wî bi zorê bidê endamên xwe. Ev gelşeke mezin e. Kovar û rojname nikarin nivê Percyê ku ji bo çap û tiştên din diçin, bi dest bixin. Di van salên dawî de bi dehan rojname û kovar ji bo wê sedemê piştî çend hejmaran hatine rawestandin. Niha ev gelş li hemberî me ye jî. Dibe ku ev diyarde ji sedema girîngî nedana kurdên derve be ji ziman, edeb û çanda kurdî re. Ez gelek caran wekî henek ji hevalên nivîskar re dibê-jim ku xemgîn nebin kurdên li derve gelekî zana û rewşenbîr in û pêwistiya wan bi xwendina kovar û rojnameya kurdî nîn e.

Niha proja nivîsa we ya nû çî ye?

● Ji sala par ve ez mijûlî nivîsandî-na komele-helbesteke nû me bi navê "Meditation" ku dibe nehemîn komele-helbesta min. Hêvîdar im ku heya havîna îsal tewaw bibe û were weşan-din. Di heman dem de projeyêke din di destê min de ye der bara rewşa kurd û bandora kolonyalîkirinê li ser çand û moral û saykolojiya (sosyoloji) neteweya dagirker û serdest de ye.

HEVPEYVÎN: SÎRWAN-REHÎM

Çend helbestên Î. Omerî

Her warek bi bilbilek

Her bilbilek bi dilek
Her bilbilek bi gulek
Bilbilê Kurdistanê
Yekî bêper û kulek

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek..

Xem nîne, ew bilbil e
Evîndarê sorgul e
Bêper û bêperwaz e
Dilê wî jî bi kule

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi dilek..

Gula wî yeke sor e
Sed dirî li derdor e
Bo çî bijart gula han
Bi destxistin pir zor e

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek..

Her çiqas sitemkaran
Bi tundî û bi daran
Çîm û perwaz şikandin
Lê, gul neda nexaran

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi dilek..

Te awazek nerm heye
Bona gul qedîfe ye
Rabe hûrik bilorîn

Dijmin re pir qebe ye

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek..

Bilbilê hêla Botan
Îroj li te zivistan
Wê bihara te jî bê
War dê bibe gulistan

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi dilek..

Bilbilê Warê Boşo
Li te dijmin qidoşo
Gulistan lewitandin
Divê tu paqij bişo

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek..

Bilbilo! Tu jar û mest î
Bo gul bû komek hestî
Bi derdê te dikele
Dê çî kî, ew bindest î

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi dilek..

Bilbilê hata gelî
Bigrî digel Omerî
Gulistan şewitandin
Tev bû rijî û xwelî

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek..



Bilbilê Kevrê Bîqul
Serhed û warê kavil
Bes bixwîne bi kovan
Te heland hinav û dil

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi dilek..

Ho bilbil, lo bilbilo!
Per şikestî, dil bi kulo
Va bihar ser te de hat
Rabe bixwîn ji dilô

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek..

Bilbilê Şax û Şêbê
Vê bihara ku wê bê
Gul û çiçek devken bin
Gulîstana tu lê bê

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek..
Bilbilê Kurdistanê
Yekî bêper û kulek.

Birakuji



Bo netewan bikin dîl
Dest û pê têxin zincîr
Birati bikin ji bîr
Wekî Habil û Qabil

Du beranên min hene
Poşek, enî bi hine...

Ji wan demên kevnare
Ta bi iro, ji xwe re

Bi zanyarî û pere
Gel dikirin du pare

Min du dikên şer hene
Li dor hev wek perwane...

Neyar bi wan tinaz kir
Bêtişfaqiyek saz kir
Ta aqilê xwe nas kir
Nirxên pîroz xelas kir.

Min hene du conegan
Bi înt, pîkol û tevdan...

Li başûrê Kurdistan
Gelê Soran û Berzan
Birakuji, bêraman
Ji dest we min sed eman

Du birayên min hene
Sûdar in, ji xwe re ne...

Du dik û du conegan
Du bira û du beran
Bi hev ketin wek şêran
Ketin xefkên çel diran...

Tu çawa yî?

Di nav ar û pê de dijîm
Hevala min tu çawa yî?
Bi kul û derdên xwe digrîm
Delala min tu çawa yî?

Hezar sal in li ser te ceng
Hatî kuştin mîrxas, leheng
Cejn û Newroz diçin bêdeng
Sersala min tu çawayî?

Şer û şepal in li colê
Li Serhedê û li Torê
Sed seg berdane derdorê
Şepala min tu çawa yî?

Şar û gund giş wêran kirin
Jiyan li me zindan kirin
Der û hundir talan kirin
Bermala min tu çawa yî?

Dema ku ez te nabînim
Hêstrên çavan dibarînim
Bi qerpalan dimalînim
Destmala min tu çawa yî?

Li pêş çavên Bro Omerî.
Agir berdan rêl û devî
Teba, tilûr jê direvî
Xezala min tu çawa yî?

Xwezî' b roja te bikim bûk
Hine bikim dest û neynûk
Bigerînim li şar û sûk
Bemala min tu çawa yî?



Li navendên çandê çalakîyên vê hefteyê

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● **11.05.97 Yekşem:** Konsera Dengbêj Salihê Qubînê, saet: 14.30
Konsera Koma Çiya, saet:18.00

● **14.05.97 Çarşem:** Semînera Mahir Gûnşiray, 'Tiyatroya din', saet:18.00

● **16.05.97 În:** Filmê belgeyî yê Ismail Beşikçi, derhêner Ahmet Soner, "36 Kitap=13 cezaevi (36 pirtûk=13 girtîgeh)", saet: 18.00

● **17.05.97 Şemf:** Fimê belgeyî yê Ismail Beşikçi, saet:18.00

Li NÇM'ya İzmirê

● **11.05.97 Yekşem:** Seven Çocuk tiyatrosu (tiyatroya zarokan),

'Sihirbaz û Palyaç', saet:18.00

● **16.05.97 În:** Konsera Koma Amed, (roja xwendekaran), saet: 18.00

● **17.05.97 Yekşem:** Panel li ser ramana azad, saet: 15.00
Konsera Koma Amed, saet:18.00

Li BEKSAVê

●

Panela "Di 97'an de 68'yi", Deniz Koç (SIP), Hakan Günarlan (Özgür Gelecek), Komîsyona Ciwanan a HADEP'ê, saet:19.00

● **16.05.97 În:** Pêşandan "Windahî (kaytlar)", saet:18.00

AWIR

Gulan û karwanê şehîdan

Di dawiya sala 1970'yê de bi sazûmankariya Deniz Gezmiş, Yusuf Aslan, Hüseyin İnan û çend hevalên din Artêşa Rizgariya Gelê Tirkiyeyê (THKO), tê damezirandin. Van lehengên hêja, di dîroka Çepên Tirk de rûpeleke nû vekirine. Piştî 12'ê adara 1971'ê darbeya leşkerî ya faşîst tê lidarxistin û pê re Deniz, Yusuf û Hüseyin tene girtin û di 6'ê gulanê de ew her sê lehengên tîr darvekirin.

Dîsa di wan deman de, şexsiyeteke mîltan û şoreşger, sazûmankar û serokê TKP-ML/TIKKO'yê, İbrahim Kaypak-kaya ye. Kaypak-kaya di lecê de birîndar tê girtin. Li Zindana Amedê, bi îşkence û lêdanên gelekî giran roja 18'ê gulana 1973'an tê kuştin.

Di dîroka têkoşîna me de, şehîde me yê pêşî, Rêheval Aydın Gül, di 8'ê Gulana 1977'an de, li Dêrsimê ji aliyê H.K'ê ve hatiye kuştin. Piştî re di 18'ê gulana 1977'an de Rêheval Haki Karer, li bajarê Dîlokê (Antep) ji aliyê rêxistina Stêrka Sor ve, bi xayintî tê qetilkirin. Şehîdbûna rêhevalê enternasyonal Haki Karer her çiqas ji bo têkoşîna me bûye windahiyeke mezin, lê dîsa wê bûyerê ji kîna hevalan mezintir kiriye, cesaret û gûrdana bi têkoşîna re xurtir kiriye û ew

ji riya me re wekî meşalekyekê bûye ro-nahî.

Di 18'ê gulana 1978'an de li bajarê Ruhayê li navçeya Hilwanê ji aliyê êla Süleymaniyan ve heval Halil Çavgun tê qetilkirin.

Êrişên rejîma faşîst li ser gelê me, têkoşîna rizgariya neteweyî her diçe zêdetir û diwartir dibe. Ev êriş piştî 12'ê rezberê de bi darbeya leşkerî ya faşîst herî bilind dibe, bi taybetî li ser insanên me yên zindanan. Dijmin di şexsiyeta wan de dixwaze, ruhê berxwedana şoreşgerî bide şkenandin, gel di şexsiyeta wan de teslîm bigire. Li hemberî vê yekê 21'ê adara 1982'yan şeva Newrozê rêheval Mazlum Doğan, bi agirpêxistina sisê niftikan re berxwedan bi bedena xwe da destpêkirin. Bi vê berxwedana xwe gi-hîşt lûtkeya lehengiyê û navê xwe bi tî-pên zêr li pelên dîrokê da nivîsîn.

Ev çirûska berxwedana Kawayê Hemdem bû meşaleyê venemir û tariya zindanê qetand, qawîş bi qawîş, hucre bi hucre, geriya. Rêhevalên hêja Ferhat Kurtay, Eşref Anyık, Necmi Öner û Mahmut Zengin, dan ser şopa Kawayê Hemdem. Di 1982'yan şeva ku 17'ê gulanê bi 18'ê gulanê re dide girêdan de zindandan kete bédengiya mirinê, her kes di xewa şêrin û giran de, guregura pêta agir û dengê dirûşman 'agir venemirînin, agir gur bikin' bilind bû, di 14'ê tîrme-hê de Xeyriyê dîlzelal, Kemal Pîrê delal, Akîfê bêmal û Eliyê dilmortal di rojîya mirinê de gav bi gav, saet bi saet deqe bi deqe mirin hambêz kirin, serê Çiyayê Gabar ronî kirin, ji rêheval Egîr re rêberî kirin û di dawiyê de ji li Dêrsimê, Edene-yê, Sêwazê- bûn Zilan, bûn Rewşen, bûn Ber-mal...

XWINDAL

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Vîndîkerdena koçgîriye û persê bêcewabî

Sebeta ke ceng ver va vîndîkerdena şiyêna, roja 24. 4. 1921 de cengawerê Koçgîriye teba domanan û cênîyan dest kenê ci ver va Dersimî kunê re raye. Heyder Beg teba 2000 sivîlan wazeno ke, vakurê Erzinganî ra ravêro û na ca ra ebi hetkariya Kurêşan û Balabalan û ebi qeweta nêwiye reyna şoro Koçgîriye.

La belê sebeta ke Koçgîrî de vilabiyene dest kerd bî ci, serokê gelê eşîranê bînan waştênê ke wertê xo yo dewlete virazê. Seba naye jî eşîra Kurêşan û Balabalan hetê Heyder Begê nêkenê.

Demo ke Heyder Beg reseno sîndorê Kurêşan, Serokê Kurêşan Paşo Kor ebi piyanê xo raye re Heyder Begî birneno û nêverdano ke, nê derbazê Dêrsimî bê.

Na mesela ser ro Dêrsim zaf hêrs beno. Sêy Abbas fekê Hoyunî û birazayê Sêy Rizayî jî fekê Arkeganî pê cênê ke Heyder Beg bişikiyo derbazê Dêrsimî bo. La belê Heyder Beg derbazê Dêrsimî biyene ra derbaz biyo. Çimke cengê Koçgîriye zaf biyo gur û hem jî Koçgîriye re mordemê çekdarî lazim ê.

Sebeta ke ceng ver va vîndîkerdena şono, Koçgîrî de talan, kîştene, destser-nayena leşkeriya wertîye (Merkez Ordularî) û hem jî Topal Osmanî bena zaf.

Na barbariya tenya mebûsê Erzurimî Hüseyin Avno beno meclîsî û hemver vecîno. Teba Hesen Xeyrî tenê mebûsê kurdan jî hemverê na barbariya vecîne. La belê zafêriya dînan hafî ra kêfweş ê.

Bado Heyder Beg jî teslîme dewlete beno. Na derbe ra dime rewşa Koçgîriye tayîna bena xirab. Pêco jî se ke êno zayayene Alîşêr û Serokê bîni derbazê Dêrsimî benê.

Na dem de hetê ra Simko û hetê ra jî Mahmud Berzencî hemverê koledaran ceng kenê. La belê yewbînan ra bê xebere, bê hetkariye...


Na pelê dîroka maya sedsera 20'an de pelêde siya wa. Na ca de tenê persî estê ke bêcewab mendê, ya jî na der heq de kesî hetanî nika bawariya xo eşkera nivata.

Pozîsyonê Kurêşan û Balabalan çik bî? Qey dîrokzanayê ma naye ser ro nêvindetê, la belê ma vacîme sarewedayena Şêx Seidî de pozîsyonê eşîr-tan ser ro zaf vindetê û zaf rêyan jî tesbîte şaşî virazê?

Diyap û Meço axayan ser ro zaf nivisiya. La belê em ro jî parlamentoyê Tirkiye de zaf Diyap û Meço'yî estê. Nê Diyapan û Meçoyan ser ro jî nênivisiyo, yan jî tayê dînan qe nêne re çiman ver?

Kurmancan ebi porotiya xo hetê yewbînan nêkero. Sebeta na hetê yewbînan nêkerdene kesî qe analiz nêkerdo û qe kes gunakar nêderdo. La belê cenganê bînan de çiyê niyanênî amê analizkerdene û kesî, eşîrî, komî amê gunaker-dene. Sebebê naye çik o?

Persanê niyanêna mordem şikîno derg bikero. La belê teyna nê persî û cewabê nînan nedayene emro, demo ke leşkeriya Tirkiye ebi hemkariya İsrail û Amerika erîşê parçede welatê ma, erîşê şarê ma û cengaweranê ma kena, tayîna biyê muhîm. Ganî cewabê nê persan hetê dîrokzanayanê ma ra bêro dayene ke ma dîroke ra, xeletiyane daye ra dersê bigêrîme, bingêyê amayena xo zixm berzîme ci.



Ferhat Kurtay



Eşref Anyık



Necmi Öner



Mahmut Zengin

Çend hejmarok û lîstikên zarokan

Yekê, yekê yekaneke
Dibistanê ezîzanê
Gulo çepo, çepilmûxo
Xanexêzê dotileynê
Serkeşîşê Yeka min e
Bis-la te- ye

Sat axa, satir axa
Qûn axa, qantir axa
Hilifi milifi
Ber tûtik, berwar tûtik
Sextilanê du rû-tik

Te, te, te Amîne
Textê Silîva textê te
Ga yê sor qurbana te
Çil Miho mêrê te
Eledin xezûrê te
Nefise xesû ya te

Ha wa ye, wa ye wa ye
Keça Amed keya ye
Li ser xênî xuyaye
Marê kor pê ve daye
Ne şerm û ne heya ye

Hopanî mopanî
Keziya binê banî
Kekê min çawîş e
Çawîşê biçûk e
Jê re hanîn bûk e
Keça Hesên Begê
Sêva ser çelengê
Tasa min xulxulî
Kuta serê dili

Çik firî mosilê
Mosla mîrkê xasî
Botanî kirasî
Keko bi testê re
Tembâr bi piştê re
Ber mala Fatê re
Fata qilopanî
Ketiye dêza danî
Got: Teyro, teyro çi ye
Got: Baskê min şikiya
Keça Hesê Beraz
Dest avêt şûrê taz
Meydan ji xortan re dixwaz

Qurba bibim Qama Qut
Elbê girt û manga lot
Xesû hat û xeber got
Mêr xeyidî neçû cot

Kirdkî

Elî qoqo, zimbêl baqo
Tirê ma xulamê ma
Şarî Şeme berda
Di eywanî ser da
Di eywanî girana
Textê xatûnana
Pîrê, pîrê ana meke
Ga û golikan tewer meke

Lengo, lengo herê min lengo
Kuçe tengo, barê min vengo

Kûştô rûştô quncik rûştô
Qelem desta cihêz nûştô

Luwê, luwê
Pale guwê
Dimse kuwê
Ha ver da, na ver da



Tir eşte, fis eşte
Cotêk piyan zî pey ra eşte
Da serê zincê kamî ro?
Da serê zin cê ... ro

Gulç

Di nava çend kesan de tê listin. Her lîstikvanek ji xwe re çend heb gulçan çêdike

Gulç: Dişibin mîxê konan, lê bî qandî niv metreyî dirêjin. Ji bo li erdê xweş biçikin, serê wan jî weke mîxê konan tèn tûjkin.

Li cihekî qiram û şilek tê listin. Pêşî cihê (erdê) şilek ji bo ku gulç tê de xweş biçikin, bi lingan baş tê dewisandin. Bi hejmarokan an jî bi pişka xîçeke pehn şil-ziwa tê avetin û dor tayîn dibe. Dora kîjan lîstikvanî be ew gulça xwe bi avêtin li erdê diçikîne. Lîstikvanê dor bê ser, wê gulça xwe li ber gulça çikandî biçikîne. Mebest ew e ku; gulça çikandî ya hevalê xwe bixîne xwarê û qezenc bike. Ango gulça bikeve dibe ya wî.

Gogê

Herî hindik bi nava du kesan tê listin. Ji bo ku 'gogê' bê listin, divê gogek û her lîstikvanek jî çovekî wî ya kaşo hebe.

Gog: Weke topekê biçûk û darîn e. Mezîniya xwe bi qandî hêka şamikan e û girover e.

Çova kaşo: Ji metreyek hinekî dirêjtir e. Serê çov, ji bo ku xweş li gogê bikeve tê pehnkirin. Jixwe cihê ku tê pehnkirin jî hinekî xûz e, loma jê re 'çova kaşo' tê gotin.

Li meydaneke rast û bê xîç an jî li mêrgekê tê listin. Li bexçeyekî bi çimen jî dibe. Pêşî, çalekê bi qandî panzdeh cm. fireh û deh cm. jî kûr tê vedan. Gog, bi qandî panzdeh gavan dûr li çalê tê danîn. Di nava lîstikvanan de, bi jimartina hejmarokan an jî bi peşka şil-ziwa

dor tê tayînkirin. Lîstikvanê pêşî bi çovê kaşo li gogê dixê. Armanca ew e ku gog bikeve nava çalê. Ger gog nekeve çalê îcar, jî cihê ku gog çûye û lê maye lîstikvanê din, lê dixê ji bo têxe nava çalê. Di dawiyê de kî gogê bike çalê ew carekê bi ser dikeve.

Çirê

Çirê, bi zêdetirî çar-pênc kesan tê listin. Bi jimartina hejmarokan an jî bi peşkavêtina şil-ziwa şûbe tê hilbijartin.

Li navenda meydaneke fireh an jî mêrgeke perçinek çovekî dirêj û bi gulî tê çikandin. Yê ku bibe şûbe li ber perçinê nobedar e û armanca wê şûbetiya xwe têxe stûyê yekî din. Lîstikvanên din jî dorê lê digirin û di nêz û dûrê wî re dibezin ku ji bo şûbe har be. Şûbe, an go nobedar jî êrîşî wan dike, destê xwe li kê bixê û careke din vegere destê xwe li perçinê xwe çirê dibe û lîstikvanê dest xwaribe îcar ew dibe şûbe. Şûbe, gere li vê navê nehêle lîstikvanekî din jî destê xwe bigihîne perçinê. Ger lîstikvanekî din bigihîne perçinê (çovê) û jî cihê wê rake û birevine wê ew dest lêdana şûbe ku li lîstikvanekê dabû wê betal be û gaki here şûbe. Bi awayek din jî, ger destê xwe li yekî bide û hîn negihabe ber perçinê, ew lîstikvanê ku dest xwaribe di nava şûbe û perçinê de derbas be angoy, oxira wê bibire. Cardin şûbe didome û gaki jî dihere şûbe.

Qaqê

Pêşî xêzeke gilor û bi qandî du gavan fireh tê kişandin. Li navenda wê xêza gilor xîçeke gilover angoy qaq tê danîn. Paşê panzdeh gavan hindiktir xêzek jî bo ku cihê avêtinê kişî be tê kişandin. Her lîstikvanek ji xwe re lehpekê digire. (Lehp: Kevirêkê bi qandî destê mirov pehn e angoy, teht e) Bi jimartina hejmarokan an jî bi peşka şil-ziwa a lehp

avêtinê dor tê diyarkirin. Lîstikvanê ku dor girtibe jî cihê xêza diyarkirî, lehpa xwe diavêje qaqê. Ger lê nexê dor dide yê din. Ger li qaqê ketibe û qaq jî xêza gilor dernekeve ev car lîstikvanê din jî ber xêza gilor, (ne jî cihê avêtina berê) lehpa xwe li qaqê dixê. Kî qaqê derxe derve, dora pêşî a lîstikê careke din jî wê bibe ya wî.

Guledest

Li cihekî rast her lîstikvanek yek jî xwe re sê heb kevîrê pehnik li pey hev rêz dike. Kevîrên pehnik, wekî li piyan bisekinin, tèn rêzkin. Nava wan tehtikan bi qandî gavekê jî hev vekirî ne. Li aliyê din, lîstikvanê din jî bi qandî panzdeh gavan jî wan kevîrên rêzkin dûr bi eynî rengî kevîrên xwe rêz dike. Dema mirov jî dûr ve li rêza her şêş kevîrên lîstikvanan binihêre, divê kevîrê pêşî ê herî mezin û fireh be, yê navîn jê hinek biçûktir û yê dawîn jî kevîrê tewrî biçûk be.

Bi jimartina hejmarokan an jî bi peşkavêtina şil-ziwa dor tê tayînkirin. Lîstikvanê dor girtibe li ber kevîrê xweyê pêşî disekine. Ji xwe re kevîrê gilover weke gule digire û li erdê gilolo dike, diavêje kevîrê tîk-kişî yê hevalê xwe. Ger kevîrê gule here li kevîrê tîk-kişî yê hevalê wî bikeve. Mafê du carên din avêtinê bi dest dixê. Ger lê nekeve, ev car dor tê serê din. Kî pêşî kevîrên ên din li erdê bixê, carekê lîstik qezenc dike û jî bo listika nû jî dora pêşî bi dest dixê.

Kap

Li ser xênî an li hewşê an jî li ciheke hişkê rast xêzeke gilor û bi qandî du gavan fireh tê kişandin. Xêzek rast jî bi qandî pênc gavan jî xêza gilor durtir tê kişandin. Ji bo ku cihê avêtinê kişî bibe.

Her lîstikvanek li navenda wê xêza gilor kap an kapên xwe li ber hev bi awayekî ku kap "mîr" bisekinin rêz dikin. Jixwe her lîstikvanek kapeke wî ya deq heye. "Kapa deq" bi piranî jî kapên giran û qew tèn hilbijartin. Henek lîstikvan, jî bo ku kapa wan deq giran be, bi biznar nava wê qul dikin û qerqesûrê helandî dirijînin hundirê kapa deq. Heta pirê lîstikvanan, 'kapa deq' hine an jî bi hubir (murekeb) reng dikin.

Bi peşka hejmarokan an bi şil-ziwa, bi piranî jî bi avêtina kapê deq (wekî mîr, kizîr, sofi û diz) dor tê tayînkirin.

Lîstikvanê dor girtibe, jî xêza avêtinê kapa deq bi nîşan girtinê diavêje kapên rêzkin yên li navenda xêza gilor. Ger li wan nexê dor tê yê/yên din. Ger li wan bikeve edî lîstikvan û li pey wî jî yên din jî derveyî xêza gilor kapê deq li kapên din dixin û dixwazin wan kapên rêzkin/ jî hevketî jî hundirê xêza gilor derxin derve. Kî çend heb kapan der bixê, edî ew dibin ên wî. Lîstik bi vî rengî dom dike. Ev listika han bi vî rengî bi "xar" an jî tê listin.

BERHEVKAR: ROŞAN LEZGÎN

Ji enstîtuyên kurdî du kovarên hêja

Avaşîn

Wesana Enstîtuya Kurdî ya Stokholmê Avaşîn bi hejmara xwe ya 4'an derket pêşberî xwendevanên kurd. Di vê hejmara kovarê de li ser gelek warên çand û hunerî, lêkolînî nivîs hene. Kovar piştî pêşgotinê bi nivîseke Mamoste Amed Tigrîs a rexneyî dest pê dîke. Mamoste Tigrîs pêşî li ser pêwistiya rawanbûna zimanê nivîsandinê radiweste û piştê jî du pirtûkên ku di nav weşanên Enstîtuya Kurdî ya Berlînê de derketine, rexne dîke. Ji minakên Mamoste Tigrîs tê fêmkirin ku gelek kêmasiyên zimên di her du pirtûkan de hene.



Tiştêkî ku vê hejmara Avaşîn ji hejmarên din cihê dîke jî, ev e ku di vê hejmarê de bi hersê zaraveyên kurdî nivîsan cih girtine. Digel helbestên bi kirmancî û kurmançiya jêrîn, nivîsên pexşanî jî hene; bi kurmançiya jêrîn (sorani) nivîsa Prof. Dr. Îzedîn Mustafa Resûl a li ser Melayê Cizîrî û bi kirmancî jî du nivîsên pexşanî; nivîsa Haydar Işık a bi navê "Astareyo sur, Kurday" û nivîsa J. Espar a bi navê "Qiseyê Namedaran".

Gelek nivîskarên kurd bi helbest, çîrok û nivîsên xwe yê lêkolînî bûne mêvanê vê hejmara Avaşîn. Bi taybetî nivîsa Dr. Sıraç Bilgin a li ser Newrozê gelekî balê dikişîne. Wekî din nivîskarên ku di vê hejmarê de cih girtine ev in: Mehmet Aktaş, Faysal Dağlı, M. Elî Tüysüz, Yaşar Kaya, Şükrü Gülmüş, Selîm Biçûk, A. Yezdan, Serkan Brûsk, Dr. Heznî Haço û hwd. Her wiha Huseyin Sawiş, Mihem Himbilij, M. Emin Pencewîni û Mafûz Mayî çend kes in ku bi helbestên xwe di vê hejmara Avaşîn de cih girtine.

Ev hejmara kovarê li gorî hejmarên din çî ji aliyê zimên ve û çî jî ji hêla naverokê ve ji hejmarên berê xurtir e. Lê dîsa jî di zimanê hin nivîsan de çewt-tewandin û çewt-bikaranîna cînavkan balê dikişînin. Bi taybetî di nivîsa Faysal Dağlı de hê di sernav de ew çewtî dest pê dîke. Sernavê nivîsê "Kê, kî, ji axa kî derdixe" ye, li gorî rêzimanê kurmançî diviyabû ew "Kî kê ji axa kê derdixe" bûya, lewre cînavkê pirsîyarkî "kî" pirsî navdêrên sade, "kê" jî pirsî navdêrên tewandî dîke. Li aliyê din di mîzanpaja kovarê de jî hin kêmasî balê dikişînin.

Agahdari

Enstîtuya Kurdî ya Brükselê wesana xwe ya ku mîna bulten derdixist, veguherand kovareke çand, huner û wêjeyî. Ev kovar wê ji du mehnan carekê derkeve. Kovar digel hinek nivîsên lêkolînî, bi helbestan jî hatiye xemilandin. Di kovarê de nivîsa yekemîn, nivîsa Medenî Ferho ya bi navê "Di



hunandina dewletî de rola çand û biserketina raman-girî" ye. Ji bilî vê nivîsê, nivîsa Dr. Zerdest Haco "Bipêşveçûna gotinên biyanî di zimanê kurdî de" gelekî balkêş e. Dr. Haco yek bi yek li ser tîkiliya zimanên ku bandor li kurdî kirine radiweste û bi çend mînan bandora wan destnîşan dîke. Lêkolînerê kurd vê bandorê tenê bi peyvan bi sînor nake, her wiha-jî aliyê hevokasî û semantîk ve jî bandora zimanên wekî erebî, tirkî û hinekên din bi mînan li ber çavan radixe. Ji xeynî van nivîskarên navborî, kesên mîna Kerîm M. Baqustanî, Bedirxan Epözdemir, Mihemed Qawaz, Abbas M. Abbas, Yurda Kaya, Temûrê Xelîl bi çîrok, lêkolîn û helbestên xwe di vê hejmara Agahdari de cih girtine.

SERWISA ÇANDÊ

Çend rewşenbîrên ereb

HELÎM YÛSIV



Li Helebê êvaran her nîvro, rewşenbîr, nivîskar, hunermend û kesên ku li torê û hunerê xwedî derdikevin, li qehwexaneyê 'Qesir' rûdiniştin. Piştî ku Qesir bû firoşgeh, niha tevde li qehwexaneyê 'Mewid' hevdu dibînin. Di van civatan de ev çend salên min in ku ez tim hazir im. Ji aş û bajar nûçe, pirs babetên çûr bi çûr tînim zimên. Ez niha dixwazim çend dîmenan pêşkêş bikim, ku mîna neynikekê xuyanî dikin ji nêrîn û ramanên van rewşenbîran, carekê em li romannivîs û rojnamevanekî ereb rast hatin, xwendina wî ya (akademiya zimanên kevî) bû. Ez û hevalekî xwe, (ew jî kurd bû) em sê saetan pê re ketin dan û stendîne ji bo tiştêkî tenê, ew jî ev bû 'Zimanê kurdî zimanekî serbixwe ye, zimanê miletekî cuda û jîndar e. Ew jî li kêleka erebî-tirkî-farisî zimanê gelekî ye.' Me kir û nekîr ku ev "rewşenbîr" bawer bike, bawer nekîr, digot ji fârisî-tirkî-erebî we ev ziman çekiriye û ma li ser a xwe hetanî ku qehwexane hat girtin. Carekê din, li ser filmê sînema civat

geriya. Ew film li ser jiyana Brahim Henano ye, yê ku bi eslê xwe kurd e û serokê şoreşekê navdar e li dijî fransîzan, dema ku wan Sûrî dagirkiribûn, yê hazir jî pir in ji wan derhênerê film û senaryonivîs jî li wir in (senaryonivîs bi xwe çîroknivîsekî ereb e) yek ji kesên rûniştî kenîya û got:

- Eger hûn min dawetî xwaringehê nekin îro û min tîr xwarin û vexwarin nekin, filmê we naçe serî. Yê sînormivîs mat ma û pirsî: Çima? Yê din berdewam kir:

- Brahim Henano kurd e û film wê ji aliyê dewletê ve bê derxistin. Ev karê we jî dijî dewletê ye. Kêfa we ye. Ezê bêjim (wan...) hûn ji partiyeke kurdî re kar dikin û kurdan hûn kirîne, di navbera ken û neken de derhênerê film peyivî:

- Tu îşbat me neaniye û tu tişt nade xuyakirin ku Brahim Henano kurd e.

- Tev wilo jî hûn min neezimîn û min serxweş nekin, îşev filmê we roniyê nabîne.

Hîn film ronî nedîtîye û di nav ken û henekan de civat belav bû. Carekê dîtir ez û sînormivîsekî televizyona Sûrî û çend kesên din rûniştibûn, ev du sal her meha remezanê sih şevên wî nivîsandine pêşkêşî temaşevanên Sûrî dibin. Herdu senaryoyên wî jî di xelesa dîrokê de digerin. Min jê re got ku di sînema û televizyona Sûrî de di drama Sûrî bitevayî de tiştêkî balkêş heye. Bi giranî gulê xwe da gotinê ku wêneyê mirovê ermenî, şerkesî, asûrî, tirkî... tim eşkere ye di karê we de, kêr-film hene ku tê de

tevkujiyên ermenyan dernakevin. Lê wêneyê mirovê kurd tim tune ye, ne bi qencî û ne bi neqencî. Tu dibê qey tu rola vî mirovî di dîroka vê herêmê de tune ye, li hemberî ve we gelek dîmen ji filmên xwe li Efrîn û herêmên kurdan tomar kirin, gelo ev tunebûn û jîbîrkirina mirovê kurd sîcê kê ye. Sîcê we sînormivîsan e yan jî ji kontrolkirina dewletê ye, wî bersiv da û got:

- Na, ne tev de ji kontrolê ye. Hinekî sîcê me ye jî. Hetanî niha min tiştêkî wisa nekiriye hetanî ku bê qedexekirin. Ez ji kurdan hez dikim lê kurd bi tirkan re di dema osmaniyan de beşdarî kuştina ermenan bûn lê mirov naxwaze bi serêşa kurdan de wan bêhtir biêşîne. Min nikaribû gotina wî nebiriya ji bo vê rastiyê ku kurd hene hetanî îro dewleta tirk ew li hemberî kurdan biçek kirîne û ji wan re dibêjin "Qoroc" heta niha ew kurdên wilo hene û wê hebin, lê gelo erebên wilo jî tune ne. Ma çêdibe ez bibêjim ereban pênc hezar kurd li Helebçe kuştin û ez dîrokê wisa bixwînim, rêjimeke dewleteke erebî ev guneh kir, lê pirsî min ev e ku çima ji bilî ve bûyerê rewşenbîrê ereb tu tiştî li ser dîroka kurdan naxwaze zanibe. Ne bi serhildan û ne jî bi şoreşên li dijî osmaniyan zanin. Ez bêhtir dixwazim li ser pêwendiyên di navbera dîrok û rastiyê de rawestim. û pirs ev e, çima hebûna kurdan di civatê de, di dîrokê de yan tê veşartin yan jî bi çewtî tê bilêvkirin.

Zencîra peyvan hev du kişand heta ku qehwexane hat girtin.

Çend pêkenokên kurd

Eyba Mele

Melayê gundekî xutbê dide, li ser ni-mêjê ba ji ber diçe. Cemaet hemû pê di-hese. Mele ji ber şermê mala xwe ji gund bar dike û diçe. Lê di vê navberê de, nav û dengê mele li nav gundiyan belav dibe, heta nişên dût re jî nav û dengê mele dibihîsin.

Mele piştî 14 salan vedigere ku se-riyekî li wî gundî bide. Tê, li serê gund qizekê dibîne û jê dipirse bê ka miro-vên ku bi kirina wî hesiyabûn sax in an na û ji qizikê dipirse:

- Li gund kî heye filankes, bêvankes dijîn?

Keçik dibêje:

- Nizanim ez wan kesan nas nakim.

Mele ji bo ku baş piştrast bibe di-sa dipirse:

- Tu çend salî yî?

Qiz dibêje:

- Ez temenê xwe tam nizanim, lê sa-la ku Mele li mizgeftê tir kiriye, ez çê-bûme.

Sê Kemal

Xalê Kemal heftê salî bû, li Mêrdînê rojêkê ji ber sûcekî adlî ji aliyê polîsan ve tê binçavkirin. Piştî dedgehê wî di-



girin û dişînin girtîgeha Amedê. Di navberê de çend meh derbas dibin. Xalê Kemal û çend hevalên wî dişînin Girtîgeha Meletyayê. Lê Xalê Kemal, her çiqas ji ber sûcên adlî hatibe girtin jî, mirovekî welatparêz e; dixwaze ku wî bişînin nav girtiyên siyazî yên ku ji

doza PKK'ê hatine girtin. Rayedarên girtîgehê bi ya wî dikin û wî dixin nav girtiyên PKK'yî.

Rojekê di civînekê de Xalê Kemal dêhna xwe dide ku ji başûrê Kurdistanê (Sûrî) du gerîla bi navê Hesên Kemal Evdîle û Kemal Reşîd jî hene. Piştî ci-

vinê bi awayekî acizbûyî diçe cem wan rûdine, çavê xwe digire û devê xwe ve-dike; agir ji devê wî dibare, wiha dibê-je:

- Hey mal ne mîrat no! Hema hûn dev ji min biqerin, ji ber zilma Kemal ev nav li min kirine, lê ev çî bi serê we hatibû ku ev nav li we kirine!?

Ereb û jina wî ya kurd

Li Başûrê biçûk gava hilbijartina ji bo parlamentoya Sûrî çêdibe, yekî ereb tim bi dengê kurdan dibe wekil. Piştî ku tevgera azadiyê li wir cihêkî giran digire û gel hemû hişyar dike. Di sa hilbijartina parlamentoyê tê kirin. Yê ereb tê propogandaya xwe li nava kurdan di-ke û wiha dibêje: "Pîreka min kurd e, zarokê min xwarziyê we ne, divê hûn rayên xwe bidin min." Wekî her demê baweriya xwe bi kurdan tîne.

Gava hilbijartin diqede tê dîtîn ku tu kesî reya xwe nedaye wî.


Ereb, bi hêrs tê mala xwe û li pîreka xwe dide. Ji ber ku kurd e jê re wiha di-bêje: "Xwezîka ez bi yeka ereb, yeka ermenî, faris û yan jî yeka tirk re bize-wiciyama; min ji we kurdan tu xêr nedît."

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (67)

XAÇEPIRSA

S	R	W	A	N	K	E	H	T	M
N	E	T	E	R	N	A			
P	E	N	H	E	V	I	K	K	
M	E	L	Ü	L	F	E	Z	A	
Ö	N	Ê	K	İ	Ş	A	Ş		
Ö	G	T	N	A	D				
F	K	Ş	E	W	A				
A	E	W	A	K					
A	Ş	T	B	E	T	A			



BEŞVA VEŞARİ → WARÊME

Bersiva Xaçepirsa 65'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 67'an Pirtûka Osman Aytar (Kurdîstana bi fiftî-fiftî) ye

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnişana xwe ji me re bişînin.

Kurdîstana bi fiftî-fiftî



Bask	Bi tirkî nav	Serbest	Rojek	Kükürt	Listikeke kompûtr
Rewşenbir ek (wêne)	Pirtûkeke M. Ferho	Cejn	Abide	Metod	
2			6		Bi tirkî sincirî
Notayek		Wextên rojê Solên hespa		Şexs	
Tipeke kurdi				Girtin	
	Yekîtîya neteweyî Têkildari atomê		Veşarî		
	8		Hidrojen	3	
Navek			Rengê deng		5
Mêvangeh			Emeg		
9			Sembola potasyûmê	Dijberî zoyî	
				Wisa	
.gan		Dij			
Bawer		Agir			
4		10	Heydê		Timûr
Reb. Xwedê					
Bi soranî ehlaq			Sûret		
			Sewab		

PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

HAZIR OL!

HAZIR OL!

* Artêşa TC bi rojnamevanan dest bi operasyonan bihare kir.



Dudilî wê dewletê bixeniqîne

CEMİL GÜNDOĞAN

Di brîfînga artêşê de hat ragihandin ku, tehdîta konseptê ji bo rejîmê guheriye. Ev guherîn di rastiya xwe de li ser du navendan pêk tê: Kêşeya kurd û têkiliyên şerîatperestan û artêşê.

Ger mirov bi xala duyemîn dest pê bike, mirov dikare bibêje ku, di serdema pêşiya me de nakokiyên artêşê û derdorên nêzî rejîmê yên din wê bi şerîatxwazan re zêde bibin. Hê vêga jî, girseya şerîatxwazan li hemberî artêşê, dilsar e. Lê belê, di vê dijberiyê de pevçûna çekdarî ji bilî komên radikâl ên biçûk ji bo demeke kurt be jî îhtimaleke qels e.

Ji ber vê yekê, nîrxandîna artêşê ya wekî "tehdîta sereke tevgera îrticayî ye" dîrî rastiye ye. Jixwe ji ber ev gotin, kesî nade bawerkirin ew qala "hevkarîya PKK û îrticayê" dikin.

Di vê qonaxê de pirsê 'ji ber kîjan pêwîstiyên artêşê dest bi propagandayê bi vî awayî kir?' di rojevê de cih digire. Bersiva vê pirsê, bi dîtina min di pratîka raborî ya dewletê de veşarî ye. Çawa ku berê, 'tehdîta komunîzmê' wekî tehdîta sereke di hate îlankirin û bi vê yekê jî di bin sîwana ewlehiyê ya

emperyalîzmê de cih digirtin, îro jî bi hinceta 'tehdîda îslamî' dixwazin piştgiya emperyalîzmê bistînin.

Di rastiya xwe de tehdîda li dijî dewletê, tevgera kurd e. Lê, ji bo ku bi çalakiyên li dijî kurdan, bi destxistina piştgiya emperyalîzmê ne hêsan e, tehdîda îslamê derdixin pêş. Ew gotin pêwîst e: ji bo hevkarîya bi siyonîzm û emperyalîzma ku fundamentalîzma îslamî jî xwe re wekî tehdîda sereke dibîne Dewleta tirk dît ku bi hevkarîya faris û ereban û bi hevalbendiyên herêmî tevgera kurd tîk naçe, politikaya xwe guhart. Dewleta tirk bi strajeyiyê nû, dixwaze bibe hevalbendê sereke yê emperyalîzmê û bi vî awayî kêşeya kurd çareser bike. Ev yek di navbera cîranên Tirkiyeyê de wê bibe sedema nakokî û pevçûnan.

Bi gotineke din, em zivirîn hatin "çareserîya Özalî." Lê çareserîya Özalî, bi faktorên derveyî pêk hatiye, lewre ji bo çareserîya kêşeya kurd hin gavên çandî û siyasî tîk xwestin. Derdorên leşkerî van rojan ji ber vê yekê qala "çareserîyê" dikin. Lê, ev kesên ku bawerîya xwe bi van gotinan tînin, xeyalperest in. Ji bo kurdan tiştên baş û cidî nayêne kirin. Berêvajî vê yekê, wê şer bi awayekî herî tund û dijwar bidome. Dibe ku, ji bo bipêşketina aborî û civakî

hin gav bî avêtin. Lê belê, ew, dixwazin di nav tevgera kurd de ji xwe re 'hevalbendan' peyda bikin. Bi gotineke din, 'çareserîyê Özalî' jî vê yekê wêdetir ne tiştek e.

Lê belê, kirin û gotinên bi vî rengî ne hêjayî nîrxandinê ne. Ji ber ku berê di şertên ji îro çêtir de çareserîyê bi-vî rengî pêk nehat, îro wê çawa pêk were? Têkoşîna kurdan - wekî berê didome, lê niha hevgerîya emperyalîstan ne wekî wê dema şerê kendavê ye û îro artêşa ku planeke vî awayî bigerîne, niha li hemberî partiyeke ku şeş milyon ray standîye (RP) tê dikoşe.

Lewre jî karbidestên dewletê, di tayînkirina stratejiya nû dedi nava dudilîyê de ne. Li ser vê yekê wiha difikirin: Terikandina hevalbendiyên herêmî û pêkanîna planên Özal an jî bi politikayên berê bêtesîrkirina Suriye û Iranê. Karbidestên tirk niha li ser van her du rîyan bi awayekî hûrbînî difikirin. Her çiqas ku generalên wekî Çevik Bir, alîgiriya politikayên Özal dikin, bi giştî karbidestên dewletê wiha nafikirin. Di van rojan de ku dewlet ji aliyê hêzên navxweyî û derveyî ve hatiye dor-pêçkirin, digel hevkarîya Îsraîlê re jî, wisa dixuye ku wê rejîm di navbera her du alternatîfan de bixeniqê, biçê. Belê, ew ne îhtimaleke dîr e.

aya: gelo (acaba)
beramberî: li hemberî (karşılık)
berhingarî: muddafa (karşı koyma)
bizav: tevger (hareket)
cendek: term (ceset)
cerd: avêtina ser tiştêkî (baskın)
cîhû: yahûdî
çavkaniyên xwecihi: çavkaniyê herêmî
derbest: cidî
derbirîn: ifadekirin
derfet: îmkân
digel: ligel, tevî (birlikte)
dijber: muhalif
dirûşm: slogan
diyarde: kirû, fenomen

Ferhengok

dubarekirin: tekrarkirin
ezmûn: tecrûbe
gelş: kêşe, pîrgirêk (sorun)
geşbûn: pêşketin, (canlanmak)
helbestvan: şair
hereşe: tehdît
hevbeş: hevpar
hevoksazî: sentaks (cümle yapısı)
kêş: wezn (ölçü)
katî: demdemî (geçici)
leheng: mîrxas, qehreman
lûtke: qopîtk (zirve)

mijûlbûn: pê daketin, (uğraşma)
navborî: tiştê ku navê wî borî
niftik: derbik, pêtik, (kibrit)
nik: cem, ba (yanında)
pesar: çolter (kır)
pêzanîn: agahî (bilgi)
pêşangeh: sergî
pêselmîn: emîn
qeyran: krîz
rasteqîn: rastûn (gerçek)
rawan: herikbar (akıcı)
serdem: heyam (dönem)
tomarkirin: qeydkirin
wate: mana; yanî
yekîne: birlik

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî

yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat

Tel: 00 32
53 64 12 62

Brüksel

Suriye:

Jan Dost

Helmî Yûsiv

Berlin:

Silêman Sîdo

49-30-69002695

Hannover:

Selîm Biçûk

49-5721-81360

Munchen:

Mahmut Gergerli

49-871-670884

Stockholm:

Robîn Rewşen

46-8-7510564

Bonn:

Ahmet Baraçkılıç

49 228 66 62 49

Rojekê kurd nas kirin û jiyan lê guherî

Ew hişaza ye. Çi tiştê ku rast dibîne, tekepeke nake, dide der. Ew paxav bi cezayan nake. Carekê ew dilketiyê riya rast û rastgotinê ye. Bayê zanista rastîn, zanyariya şerefyar lê ketiye. Sinc û exlaqê zanistiyê, prensîbên wê bi bîran dixê û ji bo wê jî serî natewîne.

ZANA FARQÎNÎ

Li ser vê sernivîsê ez pir fikirîm, ka gelo ew tam li rewşa şerefa zanist û zanyaran Îsmail Beşikçi tê an na. Dawiya dawîn min baweriya xwe pê anî ku ew sernivîs ji bo mamosteyê min ne îdiayeke mezin û bêbinî ye.

Bi rastî jî, piştî ku wî kurd nasîn, jiyana wî guherî. Hem jî ne wisa giran giran; bi lez û bez.

Di wan demên ku kurdan bi xwe nediwêribûn xwe nas bikin û li rewşa xwe werqilin, wî rahişte vê guloka agirê sotîner. Di wê dem û hengê de, li vê cografiyayê behskirina ji hebûna kurdan, navekî şoreşgeriyê bi xwe bû.

Berdêl û bergîdana vê behskirinê jî gelek giran bû. Belkî bala we kişandibe, me negot têkoşîna ji bo rizgariya gelê kurd; me got behsjêkirin.

“Sarî Xoca” hem behs kir û hem jî riya felat û azadiyê jî da ber me.

Wî di warê xwe de têkoşîneke bêeman da destpêkirin; ku hîna jî berde-wam e.

Ji gotina xwe nehate xwarê

Ew ji “xiştîna xwe nehate xwarê.” Bû nimînendeyê Brunoyê serdema me. Di gotina xwe nebihurî. Helwesta zanyar û zanyariyê careke din bi bîra me tevan xist. Her wiha, bi kirên xwe, bi çalakîyên xwe ev pend û şifreta kurdan jî anî bîra kesên fehma û tégihîştî.

Gotina rast tehl e, cira-rastan jî ne xweş e, serê we jî tê here rastiye bibêjin.

Ev e, vî camêrî jî gur û gefên dewleta kemalî ya çewşîner, vegirtox, talan-ker û şemkar xwe neda paş.

Jê danexwar.

Serî qet nekete berê.

Erê, ev tirkê ku ji aliyê nijadî ve tu tékiliya wî bi kurdan re nîn bû “di ber kurdan de” tê dikoşiya. Li gorî piraniya gelê kurd, Îsmail Beşikçi doza kurdan dikir; ku niha jî yên welê diramin ne hindik in. Ji lew re “Helal be jê re, merikê xerîb jî diavêje piştî me.” digotin. Berdevkên pergala kedxwar a çepel

jî “Çi îşê te bi kurdan ketiye? Tu ne kurd î, tirk î. Çi re rihet nasekinî?”, jê re digotin. Tew bi vê yekê jî nediman, ji bo ku wî ji doza wî sar bikin û wî bi-êşînin, bi polîsên “kok-kurd” îşkence pê dikirin.

Lê her du hin (aliyan) jî bîr nebiri-bûn helwesta zanyarê serbilind, ku mamosteyê devliken û bixwebawer, ketiye dû şeref û namûsa zanist û zanyaran...

Ma jixwe zanist ne “rastî” bi xwe ye? Gelo zanyar jî ne bidûketiyê vê yekê ye? Zanyarê ku rastiye veşêre û wê li gorî berjewendiya xwe an jî ya serdestan bi kar bîne, ma dibe zanyar?

Dilên li derve

Rastgobûna Civaknas Îsmail Beşikçi, gelo nayê maneya alîkirina rastiye? Ê, kurd bi xwe ne rastiye e?

Me di serî de daxuyand ku cira rastgoyan ne xweş e. Îcar ku çavê serdestan karibe “cîrnexweşan” bibire, tiştê ku ji destê wan bê teksîr nakin. Rewşa Beşikçi li ber-çavan e, cezayê ku lê hatiye birîn û tê xwestin lê bê birîn jî, aşkerekê ye. Çi yê hepsê û çî jî yê pereyan.

Navenda Giştî ya Komeleya Mafên Mirovan di şexsê Îsmail Beşikçi de dest bi kampanyaya Serbestiya Derbirîna Ramanan kiriye.

Ev yek bû sedem ku em çend tiştan li ser vî xweşmêrî bibêjin. Beşikçi dil e; ev e serê çend salan e ku di piştî derî de ye. Me divê em bidin xuyakirin ku, ew jî me gelekên li derve, azad û sesbestir e. Belê, mêjî û canê wî na, lê ten û gewdeya wî li hundirê girtûgehê ye.

Ew hişaza ye, çî tiştê ku rast dibîne, tekepeke nake, dide der. Ew paxav bi cezayan nake. Ne xem e jî jê re, ku ew ne li mala xwe ye. Carekê ew dilketiyê riya rast û rastgotinê ye. Bayê zanista rastîn, zanyariya şerefyar lê ketiye. Sinc û exlaqê zanistiyê, prensîbên wê bi bîran dixê û ji bo wê jî serî natewîne li hemberî şemkaran.

Gelo wê rewşa dilên li derve, ew ên ku hê jî ditirsin xwe nas bikin, newêrin ku rastiye bibêjin çawa be?



A rast kampanya ji bo wan pêwist e....

Min di destpêkê de ji bo Beşikçi gotina “mamosteyê min” bi kar anîbû. Ez dixwazim sedema vê yekê jî diyar bikim. Gel em bi navê vî peyayê rastiye nas kir. Gava li hemberî pîrsa “Hûn li unîversîteyê kîjan beşê dixwînin?”, me bersiva “Em beşa civaknasîyê, ango sosyolojiyê dixwînin.” dida, hema yek-ser digotin me:

“Hûnê jî bibin wekî Îsmail Beşikçi?”

Wî bi gelê me sosyoloji da naskirin
Beşikçi, civaknasî jî bi gelê me da

naskirin; ew gelê ku pirtir dixwest zarokên wan bibin bijîşk, parêzer, endezyar... Jixwe ji wan pişeyan pê ve navên gelek pişeyan nedizanîbûn. Ji ber ku ji wan re “ne pêwist” bû.

Ê, jixwe, her kes li gorî rewşa xwe dixwaze.

Ma maka xwestinê ne pêwistî ye?

Îcar Beşikçibûn, ne karê her kesî ye, ew bi xwestinê pêk nayê. Em nabêjin ku Beşikçibûn ne gengaz (mumkun) e, lê zor e, wêrekî gerek dike, pêdivî bi cewher û qabiliyetê heye.

Em bi vê gotina xweş û watedar xalê deynin dawiya nivîsê: Yek heja ye hezarî, hezar ne heja ye yekî.